DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# DARA HINARÊ

## *Yaşar Kemal*



NÛDEM

# DARA HINARÊ

# DARA HINARÊ

*Yaşar Kemal*

Roman

Wergera ji tirkî: *Firat Cewerî*

NÛDEM

Weşanên NÛDEM 37
Dara Hinarê
Stockholm: 1998

© Kurdiya wê Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan NÛDEM
Wêneya bergê: Bişar Îsa
Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri
ISBN: 91 88592-37 5

Adres:
Nûdem Box 177
177 23 Järfälla-Sweden
Tel û Fax: 8-580 131 62, 8-583 564 68

# ÇEND GOTIN

Min ev romana ha di sala 1986an de bi navê Dr. Poloço wergerandibû kurdî. Paşê gava me di destpêka salên 90î de dest bi weşandina kovara Nûdemê kir, me di du hejmarên Nûdemê de; di hejmarên 2 û 4an de beşê pêşî ji romanê weşand. Hingî kêfa xwendevanan jê re hatibû û wan xwestibû ku em hemû romanê li dû hev biweşînin. Lêbelê, her ku çû hejmara nivîskarên kovara Nûdemê zêdetir bûn û loma her ku çû cih jî di Nûdemê de tengtir bû. Ji berdêla weşandina romanê, me maqûltir dît ku em cih bidin nivîskarên nû û em bêtir berhemên nivîskarên zimanê kurdî biweşînin. Ji ber vê sebebê ev romana ha wilo ma. Ji ber ku min ew bi destan wergerandibû û ji ber pirbûna kar, min di xwe re nedidît ku ez wê derbasî komputerê bikim. Lê gava di sala 1996an de min Yaşar Kemal li Stockholmê dît û soza çapkirina pirtûkê dayê, êdî ji min re bû barek û min xwe mecbûr dît ku ez

wê derbasî komputerê bikim û mîna pirtûk çap bikim. Mîna tê zanîn min berê bi navê Dr. Poloço hem werdigerand hem jî dinivîsand. Lê min niha dev ji navê Dr. Poloço berdaye û ez bi tenê navê Firat Cewerî bi kar tînim.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...

**Firat Cewerî**
Stockholm, 1998

Jina Memed li deşta bê ser û bin li ser lingan rawestiyabû. Dû re ew daqûl bû û wê bi destan erd veda. Piştî demekê, çend tov dîtin. Wê ew tov di nav destên xwe de birin û anîn. Paşê xistin nav diranên xwe û dawiyê xistin bêrika xwe.

Wê dû re xwe bi xwe got:

– Wey li min be, wey li belengaziya min be. Hemû jî riziyan e. Wey li min be.

Ew dîsan bi destan li nav axê geriya, wê çend tovên din jî dîtin. Ew jî xistin nava diranên xwe. Paşê bi hêrs tif kir, avêt û got:

– Wey, weey keda min.

Di nava erd de tu hêşinayî tune bû. Ji serî heta binî erdekî rût dixuya.

– Em ê bimirin, wê got. Em ê îsal bimirin... Wey, wey li serê min ê bi derd be.

Dû re ew rûnişt û bû qomik. Li wê deşta bê dawî dinihêrî, li wî erdê mirî dinihêrî. Ji êşê serê wê kirî biteqiya. Carê di nav re jî digot:

– Axx, ax keda min.

Ew heta danê êvarî nikarîbû ji cihê ku rûniştibû rabûya ser xwe.

Di cihê xwe de sar mabû. Wê wilo li ber xwe dida, ku te

digot qey wextî ruhê wê were standin. Dû re ew rabû ser xwe û kete rê. Roj çûbû ava. Ew bat malê, bêkêf û bi dilkulî li ber kuçik rûnişt.

Memed:

– Keçê, got, çi bûye?

Jina wî bi hêrs got:

– Here. Here Çûkûrovayê, tovên ku me avêtine hemû riziyane. Em ê heta deh rojan çi bixwin? Zad hemû riziyane. Xwê nemaye. Em ji arvên buburîn xwê nemaye.

Di nava xênî de du kehrikan bi hev re dileyistin. Çar zarokên bi kincên pertalî li bev civiyabûn, bêî ku bipeyivin, ew wilo li ser lingan rawestiyahûn. Tenê yê herî biçûk, bi kirasê xwe yê qetiyayî, bi fişefiş lîka xwe dikişand.

Memed:

– Em ê hizina belek bifiroşin, em ê ji xwe re kîsek genim bikirin û dawiya maye jî em ê ji xwe re pê xwê bikirin.

Jinikê:

– Bifiroşe, got. Bifiroşe da em ji wî pariyê qêtix jî bibin.

Memed:

– Gava ez ji Çûkûrovayê vegerim ez ê du heban bikirim, ez ê çar heban bikirim.

Jinik:

– Bikire, got. Bikire! Bifiroşe da em hişk bihin.

Memed hêrs bû:

– Ez ê hifiroşim! got. Hem jî ez ê bi xweşikahî bifiroşim.

Jinik:

– Bifiroşe, got. Bifiroşe! Bifiroşe da em bimirin.

Dotira rojê Memed bizin firot Dûre Efendiyê ji gunê bember.

Weke ku mirî ji malê derbikeve. Jinik ji bo bizina belek di

ber xwe de bi îskînî digiriya. Memed jî nikaribû bihata malê. Wî nikarîbû li rûyê jina xwe binihêriya. Ji ber vê yekê, ew her li derve digeriya.

Bayekî sivik zibilên bizinan ber bi dîwaran ve dibir. Ji wê de Memed hat. Dû re jî Husik. Li ber dîwarê xaniyekî rûniştin. Li ser Çûkûrovayê peyivîn. Ew ê sibehê zû têketina rê û biçûna.

Husik:

– Derewan dikin, got. Çawa kar li Çûkûrovayê tuneye? Ew Çûkûrovaya mezin!

Memed:

– Derewa dikin, bi hêrs got. Derew. Ew karkeran nabînin, ji bêkarkerî dimirin li Çûkûrovayê.

– Derew, derew... Tenê ku mirov bigihîje Çûkûrovayê. Niha li Çûkûrovayê weke segan li ber mirov digerin.

Piştî kurtedemekê Ûsiv hat. Herduyan bi hev re :

– Hat, gotin.

Ûsiv berî ku rûnê:

– Min bihîst, got. Min bihîst ku hûn diçin Çûkûrovayê. Min bihîst ku...

Husik:

– Em diçin, got. Ez, Memed û Aşik Alî em ê herin.

Ûsiv:

– Tuh, got. Aqilê we. Hûn diçin mirinê, hûn diçin nexweşiyê. Hûn diçin tayê, hûn diçin ziqûmê. Aqilê we. Ev Çûkûrova ye!

Hûn Çûkûrovayê ji min bipirsin. Ez bi Çûkûrovayê dizanim. Dêhnino! ji birçîna bimirin û dîsan jî neçin! Ji xortaniya we re heyf e. Bira Memed, yê te çar zarokên te wek çar gulan li dû te hene. Vê yeka han meke. Yên ku diçin venage-

rin, ku vedigerin jî weke min bi nexweşî vedigerin.

Memed:

– Tu çara wê tuneye, got.

Husik:

– Em dizanin, keko, lê çare tuneye, got.

Ûsiv:

– Yên ku bi Çûkûrovayê dizanin, dizanin. Ez bi Çukûrovayê dizanim.

Dişewite. Aveke wê heye weke xwînê ye. Her mêşeke wê weke gurekî birçî ye... Weke ewr bi ser mirov de digirin û xwîna laşê mirov hemûyî dimêjin. Dişewite keko, dişewite... Werin, vê mekin. Li rewşa min binihêrin. Min bidin ber çavan.

Werin, vê mekin. Ava wê pîs e, gemarî ye, weke xwînê ye... Werin hevalno!

Gotinên min peyvên hevaltiyê ne, şîreta bavan e. Li rewşa min binihêrin, birçî bimirin, dîsan jî meçin. Ji birçîna bimirin dîsan...

Kar heye, pere heye, nan heye, şîrê çûkan jî heye; tu çi bixwazî heye, lê mirin jî heye. Perîşanî û belengazî jî heye. Ta jî heye, êşa zirav jî heye. Li rewşa min binihêrin... Çûkûrova dişewite, dişewite... Heger hûn bi ya min bikin hûn naçin.

Husik:

– Çara wê tuneye, em bimirin jî dîsan em ê herin.

Memed:

– Em ê biçin.

Husik:

– Mirin ji feqîriyê çêtir e. Ta ji belengaziyê çêtir e. Êşa zirav ji tunetiyê çêtir e.

Memed:

– Em ê biçin, got.

Ûsiv:

– Li rewşa min binibêrin, got. Ez naçim.

Heger ez careke din biçim, wê li wir meytê min bimîne. Ez careke din naçim. Ez ê pel û qaşilên daran bixwim, lê ez naçim.

Memed:

– Em ê biçin, got.

Husik:

– Mirin ji bejariyê çêtir e. Em ê herin.

Ûsiv:

– Li rewşa min binihêrin.

Wî bi destê xwe yê rastê her zikê xwe nîşanî wan dida. Zikê wî weke zikê jineke avis werimî bû. Stûyê wî weke şivekê zirav, lêvên wî yên qalind qelişî û perçivîbûn û di rûyê wî de piça xwînê nema bû.

Ser û binê wî perîşan bûbû. Pehniyên lingên wî yên xwas perçivîbûn, bûbûn weke lastîkên otomobîlan.

Husik:

– Mirin heye veger tuneye, got.

Ûsiv:

– Ya min şîreta hevaltiyê ye, got. Her mêşeke wê...

Husik:

–Tu bi Xwedê bikî bes e Ûsiv, got.

Ûsiv careke din devê xwe venekir.

Lihêfên wan ên pînekirî li piştên wan bûn. Dasên xwe jî xistibûn ber piştên xwe û li bendî Memed rawestiyabûn.

Memed bi jina xwe re dipeyivî. Dû re:

– Di xweşiyê de bimîne, wî got û meşiya.

Jina wî bi dû wî re:

– Zad hemû riziyaye, got.

Roj bilind dibû. Ew dereng mabûn. Ketin rê. Ta ku axa sipî ya xaniyên gund ji ber çavên wan winda bûn jî, ew li pişt xwe dizîvirîn û li gund dinihêrîn.

Ew wisan dimeşiyan, ku ax di binê lingên wan de diherifî.

Dengek ji pişt wan hat. Ew rawestiyan. Dîtin ku Ûsiv bi bazdan bi dû wan de tê. Heta ku Ûsiv gihîşt ba wan ew ji hal de ketibû, bêhna wî diçikiya.

Ûsiv:

– De rawestin, got. Ez hebekî bêhna xwe berdim. Ez ji gund heta vir bi bazdanê batime.

Li Ûsiv civiyan. Piştî Ûsiv hebekî bêhna xwe berda û bi ser hişê xwe de hat, got:

– Ez fikirîm, ez hizirîm, ez bi dû we de hatim. Kurdan gotiye, mirin mirin e, ev xirxira han çi ye!? Mirin mirin e...

Bimeşin.

Asman çikî sayî bû. Ew deşta dûz di bin lingên wan de diherifî.

Dema ku ew di kêleka erdan re derbas bûn, daqûl bûn û destên xwe li nav erdê gerandin.

– Xêr tê de tuneye, wan gotin. Çênabe...

Memed:

– Ku xêr tê de hebe jî ji çi re dibe. Bostek e. Biçine, biçine dest namîne, neynûk namîne. Zadê jê tê jî du kulm in. Ma ku xêr tê de hebe ji çi re ye?

Husik:

– Bila tune be, got.

Aşik Alî:

– Ku hebûya baş dibû, got. Ji qet nebûnê çêtir e.

Ûsiv:

– Bila Çûkûrova têkeve binê erdê, got.

Ên din keniyan.

Ew gihîşin Akpinarê. Li wir rûniştin û bêhna xwe berdan. Av vexwarin, ser çavê xwe şuştin. Bi carekê ve lê nihêrîn ku ew ji xwe re çi bibînin, şivanê Keklikoglu Memedê Zarok di ber wan de derket.

Husik:

– Xêr e, Memedo, got. Tu li van deran çi digerî?

Memedê Zarok:

– Ez diherim, got. Ez ê herim Çûkûrovayê. Min çûyina we bihîstibû, ev du rojên min in, ku ez li vir, li benda we me. Ez ê biçim, êdî.

Bila êdî Axa ji xwe re şivanekî weke min bibîne. Min xistiye serê xwe, êdî ez biçim.

Memedê Zarok zeyif, weke şivekê bû, lê dest û lingên wî mezin bûn.

Aşik Alî:

– Te baş kir Memed, got. Min bihîstiye nebihîstiye, tu li ber deriyê Keklikoglu yî.

Husik:

– Ne heq, ne tu tişt, ne wisan e?

Memedê zarok:

– Ez mirim, got, ez ji canê xwe aciz bûme.

Husik:

– Her roj jî lêdan...

Aşik Alî:

– Tu ê rizgar bibî, got.

Memedê Zarok:

– Ma ew ê li Çûkûrovayê mafê min bidin min?

Aşik Alî:

– Çûkûrova jî ya Keklioglu ye, got.
Husik:
– Hela hela, got.
Memedê Zarok:
– Mafê min, got.
Memedê din:
– Metirse, got.
Memedê Zarok:
– Ez ê cotek gayê quloçmezin bikirim, got.
Ûsiv:
– Çûkûrova di bin erdê keve, got.
Aşik Alî:
– Paş ve vegere!
Ûsiv:
– Çavên sedemê kor bibe, got.
Memedê Mezin, yanî Memedê din:
– Xwişkeke min heye, got. Layiqî Çûkûrovayê ye. Keko, ez çi dibim bila bibim, lê xwişka min layiqî Çûkûrovayê ye. Xwişka min wisan ji min hez dike ku... Em ê rast herin çewlikê (çîflikê) Xwişk di ser xwişka min re li Çûkûrovayê tunene, Em ê heta payizê li çewlikê bixebitin.
Meşiyan, şevekê li Çûkûrovayê razan. Ji wir ketin rê:
– Gund di ser gundên Çûkûrovayê re tunene, gotin. Ew yekemîn gund in, ku ji xerîban hez dikin.
Ew di riya dûz re meşiyan, bi ser serkêş ketin, daketin bin serkêş. Li ser zinarekî rûniştin û nan û çolika xwe xwarin. Bêhna zenbûrê ya xweş ew dêhn kirin. Paşê wan xwe dirêj kirin û cigarên xwe kişandin. Ew ji Mazgaçê derbas bûn. Daristan dixuşxuşîn. Li ser girê Çîçekê çadirên koçeran dîtin. Ji çadiran dûxan pêl dibû. Keçikên pêşmalsor dew diki-

landin. Li Sigrîngaçê li hemberî wan kurdekî pêxwas û serqot, digel jina xwe û pênc zarokên xwe kerek di ber wan de bû û dihatin.

Jina yê kurd û her pênc zarokên wî wisan zeyif bûn, ku te pif bikira wan ew ê biketana. Li wan tu tişt nemabû. Te digot qey ev çil salên wan in ew di xelayê de ne. Silav da wan û derbas bûn.

Bi kurtebiriya gotinê, piştî rêveçûna du rojan ew gihîştin Çûkûrovayê. Ava Savrûnê bi xuşîn diherikî, zelal...

– Li jorî Dîkîrlînê, li bin darekê çavên xwe nerm kirin. Gava ew hişyar bûn, roj ber bi ava diçû.

Memedê Zarok çavlixew, bêdeng hêdî–hêdî çû ba Memedê din. Devê xwe bir ber guhê wî û hêdî:

– Apê Memed, got. Li vir mafê min naxwin ne?

Memed:

– Metirse, got.

Memedê Zarok bi kêf got:

– Tu bi rastî dibêjî? Ma ew ê li vir mafê min bi temamî bidin min?

Memed:

– Ez ji te re dibêjim, metirse, got.

Memedê Zarok:

– Ez ê cotek ga bikirim, got, cotek gayên quloçmezin. Ez ê pir bixebitim.

Memed:

– Ez ê te emanetî xweha xwe bikim. Tu ê ji xwe re kar bikî.

Memedê Zarok:

– Mafê min... got.

Memed:

– Metirse, got. Li vî welatî di ser xweha min re tuneye.

Wan lihêfên xwe avêtin piştên xwe. Aşik Alî tembûra xwe ya serî bi gulî xist destê xwe.

Memed:

– Çiftlik li vê jêrê ye, got. Em ê niha bigihênê. Ku xwişka min me bibîne ew ê ji kêfan bifire. Ew ê li zarokan bipirse. Wê çend sal berê du kirasên nikenû dabûn jina min. Koroxliya me hê jî wan kirasan li xwe dike. Ku em niha bigihên wir ew ê me bifermîne hundir. Ew ê karê herî baş bide me. Em ê heta payizê bixebitin.

Husik:

– Xwehên wenî li Çûkûrovayê nayên dîtin.

Memed:

– Ger axa rojê yekê bide xelqê, ew ê rojê yek û nîvê pê bide dayîn. Ji bo we jî dê bibêje, ev hevalên Memed in.

Aşik Alî:

– Xwedê bike wisan be.

Memed:

– Jinên weke xweha min nînin. Hûn ê niha bibînin. Çer ku em bigihîjin wir ew ê nên derxîne.

Memedê Zarok:

– Mafê min...

Memed:

– Metirse.

Memedê Zarok:

– Ên quloçmezin...

Memed:

– Ez bi qurbana xweha xwe bim. Ger ceger bi axê re hebe, bila mafê kesî bixwe. Xweha min ê derkeve hemberî wî û bibêje, ji Xwedê bitirse, ma mafê van belengazan tê xwarin?...

Hingê dê axa bi lez derbixe û bide.

Aşik Alî:

– Heger weha be divê mirov xwe ji xwebên wisan re bike bi qurban.

Memedê Zarok:

– Yên quloçmezin...

Husik:

– Ez ê quloçên mezin di diya te kim, got. Quloç, quloç!

Memed:

– Dev ji lêwik berde, Husik, got. Wî xwe dîtiye nedîtiye ew li ber deriyên xelqê ye.

Aşik Alî:

– Dest lêwik medin, got.

Memedê Zarok:

– Ez ê pir bixebitim, got.

Memed:

– Cotek gayên mezin hebûn, got, min wek çavên xwe li wan dinihêrî. Xweha min digot, di nav karkeran de yê ku wek te li gayan miqateye tuneye. Xweha min weba digot. Gava ez ji wir hatibûm, gayê min ê zer giriyabû.

Aşik Alî:

– Hela, hela, got, hela Memed!

Memed:

– Heger ez derewan dikim, ez xêrê ji zarokên xwe nebînim. Gava ez hatim wî stûyê xwe xwar kir û xwe alast. Hûn ê niha bibînin. Ku gayê zer min bibîne ew ê min nas bike. Ew ê ji kêfa di cihê xwe de bileyize û biûre. Hûn ê niha bibînin.

Aşik Alî:

– Xwedê bike wisan be, got.

Memed:

–Tew jî xweha min, got. Em ê bi saya serê wê bi hêsanî peran qezenc bikin.

Memedê Zarok:

– Ez ê ji xwe re cotek ga bikirim, got, cotek gayên ku ji min hez bikin.

Husik:

– Tu ê bikirî, got, tu ê bikirî...

Aşik Alî:

– Dest lêwik mede, Husik, got. Roj nedîtine hîn, çenikek zarok e...

Husik:

–Em destê nadinê...

Memed:

– Zikên karkeran sal donzdeh meh bi şorba mirmirkê dinepixin. Xweha min nanê bi goşt û rûn dide min. Xweha min evqasî ji min hez dike.

Ew ketin hundirê çewlikê. Hewşa çewlikê tije traktor, zadçin (bîçer), erebeyên hespan, kamyon û jîpên hêşîn, sor û zer bûn. Di bin tava rojê de dişewitîn. Masey–Harris û Farguson, makînên bi markeyên cûrbicûr... Çend peyayên kincboyax bi tebatî li dora wan makîneyan diçûn û dihatin.

Memed:

– Wa ye xweha min, got û meşiya.

Şelwerekî reş li xweha wî bû û emir dida nanpêjên tenûrê. Xweha wî yeka qûnmezin û dagirtî bû. Ji enîşka wê heta bi bazinê destên wê tijî bazinên zêr bûn.

Memed ber bi wê çû, çû ba wê, tu nemabû ku ew li hev biqelibiyana. Xweha wî hîç guh nedayê. Memed şaş û ecêbmayî mabû, hîna jî dikeniya. Herçar hevalên wî li wir rawes-

tiyabûn, geh li Memed, geh jî li xweha wî dinihêrîn.

Memed xwe negirt:

– Xwişkê, got, ez Memed im...

Jinikê ew wisan raçav kir.

Memed:

– Xwişkê, got, ez Memed im, Memedê pale... Ma nayê bîra te ku min bi gayê zer cot dikir. Em hatine paleyiyê xwişkê, ez Memed im.

Jinikê serê xwe hilda, li wî nenihêrî û zivirî ser pîrekên nanpêj.

– Nanekî bidin evê han, bila here, got. Jineke nanpêj nanek dirêjî Memed kir, ew nan wisan di destê Memed de ma. Wek te satilek ava sar bi ser da kiribe, xwîna di laşê wî de ziwa bû. Rûyê wî reş û zer bû.

Bi hêdîka:

– Xwişkê, got, xwişkê, ez Memed im. Memedê Pale. Gayên zer. Ma nayên bîra te, gava ez çûbûm wan stûyê xwe zivirandin... Gayên zer li ku ne?

Xwişkê bê ku lê binihêre, pişta xwe dayê û ber bi malê ve meşiya.

Memed ji vê ecêba han tiştek fêmh nekir, bi gêjî nan di destê de û li hevalên xwe zîvirî.

Hevalên wî tu tişt jê re negotin, lê dû re Aşik Alî:

– Guh mediyê, Memed, got. Vir Çûkûrova ye. Ne ku em nizanin. Guh mediyê. Xwezî te bikarîba gayên xwe yên zer bidîtana. Kî zane bê wê belengazan çiqasî kêfxweş bibûna.

Ew çûn aliyê çiftlikê yê din, pişta xwe spartin dîwêr û rûniştin. Husik girs bû, bi qasî du peyan bû. Aşik Alî zeyifokî, Memed dirêj bû.

Gava lawikekî bi tilûmê bi yax û qetiyayî di ber wan re

derbas bû, çavên wî li Memed ketin. Lawik ber bi wan ve reviya.

–Hooo apê Memed, tu bir xêr hatiyî, tu bi xêr û silamet hatiyî, got û çû destê wî.

Lawik hijdeh salî xuya dikir.

Min wer bêriya te kiribû, wer bêriya te kiribû, ma tu li ku ma yî? Tu du sal berê çûbûyî ne wisa?

Min wer bêriya te kiribû, min xwe bi xwe digot, ew li ku be ê rojekê derkeve û were. Tu bi xêr hatî, tu bi xêr hatî. Lawik kirî ji kêfa bifiriya. Pir şikir apê Memed, pir şikir ku min tu dîtî. Min digot, çawan be tu ê rojekê werî, a va ye tu hatî.

Memed:

–Hela rûne, got.

Lawik rûnişt.

Memed:

– Zero, te bihîst bê xweha min çi anî serê min? Min qet bawer nedikir ku dê xweha min weba be. Min ev ji diya xwe dipa, lê min ji xweha xwe nedipa. Gava pale bi xwarina şorba mirmirkê zikê wan dinepixî, xweha min nanê bi rûn û goşt dida min. Serê xwe hejand. Min ev hêvî nedikir. Min di xewna xwe de bidîta, min ê bawer nekira. Ev çi ecêb e? Ez şaş mame, Zero!

Zero:

– Mepirse apê Memed, mepirse, got.

Tiştê ku li vir dibin tu bibihîzî wê devê te ji hev bimîne. Xwişkê ne xwişka berê ye. Bi tenê ez li çewlikê mame. Tu kes nemaye. Xwişkê yên din hemû qewirandine.

Memed:

–Min bawer nekir, got. Min bawer nedikir...

Zero:

– Xwişkê hate dizîn, got. Dibêjin ku ew bi dildariya reş ketiye.

Memed:

– Çiii?

Zero:

– Çirka ku ev motor hatine, ew evîndar bûye. Motoran ew dizîne. Dil ketiye motoran...

Memed:

– Wey li minê! got.

Zero:

Her sibeh, hema ku ji xew radibe, radihêje satilek av û qalibek sabûn, diçe ser motoran û teker û motorên wan dişon û wan paqij dike. Ku ew piçek herî û toz li wan dibîne, ew dêhn dibe. Ew her rojên Xwedê wan dişo. Dibêjin ku dilê wê ketiye tirimpêlan.

Memed:

– Wey xwehinga min, got.

Aşik Alî:

– Zor e, got. Xwedê neyine serê tu kesî. Evîndarî zehmet e.

Zero:

– Ji roja ku tirimpêl hatine, ew nabêje ne zivistan e, ne pûk e, li ba şofêr siwar dibe û diçe nav zeviyan. Ew her rojên Xwedê wisan dike.

Memed:

– Wê ez nas nekirim, got. Wey xwişka min a belengaz. Qey weha ye ha! Ji evîndariya ku tê gotin zortir e. Wey belengazê!...

Zero:

– Ne dêhn e, got, ew dîsan weke berê ye. Ew evîndar bûye, çawa te nas nake?

Memed:

– Min bawer nedikir. Ev qet nedihat bîra min. Wisan be, hişê wê li serê wê ye, lê evîndariya reş... Xwedê şifa xwe lê bike...

Zero:

–Tiştên li vir dibin tu bibihîzî! Rojê hezar pale tên û hezar diçin. Pale weke lavlakê ne. Kar tuneye, hal tune... Xwişkê jî şaş maye. Arvan têr nake, nan têr nake. Tenê bide, bide.

Aşik Alî:

– Wisan ha!

Zero li Memed zîvirî:

– Ger haya te ji tiştê ku dibe çêbibe, tu ê hingî fêhm bikî...

Welî axayê kal, Dûrsûnê Kût...

Memed:

– Çi bi Welî Axayê kal hatiye? got.

Zero:

– Qet mepirse, got. Tiştê bi serê wî de hatiye, qet mepirse.

Memed:

– Rûyê wî bi nûr bû, got. Kar jî dikir, mirov digot qey ew xortekî bîst salî ye.

Zero:

– Çû, got. Hemû çûn, bi tenê ez mame. Li Welî Axayê kal mepirse...

Memed:

–Min di mereqê de mehêle. De ka bibêje bê çi bi wî hatiye?

Apê Memed, got. Gava ev tirimpêl hatin, axê em hemû qewirandin. Hemû vekişiyan û çûn. Welî derket hemberî axê û got, axa, ji Xwedê bitirse, ev çil û pênc salên min in,

ku ez li ber deriyê te me.

Ji Xwedê bitirse, axa, min riha xwe li ber vî deriyî spî kiriye. Pişta min, li ber vî deriyî tewiyaye. Ez ê piştî vî emirî bi ku de herim. Ez ê çi karî bikim? Di vê goristanê de jina min radizê, diya min radizê, sê zarokên min radizên. Axa, wê Xwedê keviran bi ser te de bibarîne. Vê zilmê meke. Axayê gawir, min tu di hembêza xwe de mezin kir, min tu lorand û mezin kir... Hîn gûyê te di nava neynûkên min de ye.

Ez ê piştî vî emirî bi ku de herim? Lê, apê Memed, wî wisan got. Giriya, gazin kir, xeber da, li ber geriya, du rojan li ser vî kevirî rûnişt, riya xwe rûçikand, nifir kirin. Nedibû, ew ket rê û çû. Kes nizane bê ew çûye ku.

Memed:

– Çi peyayekî baş bû, got. Lê Dûrsûnê Kût?

Zero:

– Ew niha di hepsê de ye. Ew bûye hepsî.

Memed:

– Hela li Kûto binihêrin, kuro, got, mirov qet bawer nedikir.

Zero:

– Axê hemû pale dane hev, êdî ji we re kar nemaye, got.

Oxira we ya xêrê be, got. Hemû çûn. Kûto jî çû. Mehek du meh di navberê de derbas bû, me dît ku serê tirimpêla Massey-Harris tuneye. Serê wê jê kiribûn û biribûn.

Tirimpêla mezin mir. Weke dêhnan li axê hatibû. Çû hukûmetê, çû ba walî, çû Ankarayê. Dû re Kûto li cihekî gotibû, min weha û weha kiriye. Hukûmetê ew girt, lêxist, ew dane elektirîkê. Kûto gotibû, ji ber ku axê ew birçî hiştiye, wî ji înada axê re wisan kiriye. Gotibû, oxx, min tola xwe hilanî. Wî serê makînê jê kiribû û avêtibû cîhê Anavarzayê yê

herî kûr. Gotibû, êdî ez bimirim jî ne xema min e....

Niha ew di hepsa Edenê de ye. Axa geriya negeriya serê tirimpêlê nedît.

Tirimpêla Massey–Harris mir.

Memed:

– Çi li ba xelqê heye, got. Kûto qet nedipeyivî, tim difikîrî...

Zero:

– Hemû çûn, bi tenê ez mame. Ez ê jî biçûma, lê hostê got, ev ji kar re dibe. Ez ê bibim şofêr. Ez li ba hostê dixebitim.

Memed:

– Gayên zer, got.

Zero:

– Axê ga hemû firotin. Gayê te yê zer û gayê mor jî kirin. Ev makîne heye ya, ev makîna mezin, jê re dibêjin, zadçin, roja ku axê ew aniye gayê zer û gayê mor li ber tekerên wê serjêkirin, jê re kirin qurban. Xwîna wan di bin tekerên wê de herikandin. Lê, gayê zer ji makînê re kire qurban...

Memed fikirî û di cihê xwe de sar ma.

Zero:

– Ev heye ya, ew hem diçine, hem dukute, hem jî dixe çewalan û dide destên te.

Êdî kar nema. Rojê hezar pale tên û hezar diçin. Dilê mirov bi rewşa wan perçe–perçe dibe... Dilê hostê jî bi wan dişewite...Van tirimpêlan hemûyan bişikîne, bişewitîne, dibêje, here ba Kûto... Dilê hostayê me pir bi rewşa van paleyan dişewite.

Aşik Alî:

– Peyayekî baş bûye, got. Kî be ew ê ji dewlemendan hez

bike. Divê mirov ji belengazan hez bike.

Zero ji cihê xwe pekiya:

– Hûn niha birçî ne, ez herim ji we re xwarinê bînim. Piştî kurtedemekê Zero digel qûşxanek şorbe û heft–heşt nanên somin vegeriya.

– Ku Darendî li vir bûya min ê ji we re helaw bianiya, lê ew ne li vir e.

– Spas, weke ku te anîbe, gotin.

Piştî ku wan nanên xwe xwarin, derketin derveyî çewlikê. Lihêfên xwe kirin wek behlîfan û razan.

Adinî rojê, sibehê zû dîsan Zero şorbe û nan anî.

– Apê Memed, got. Hosteyê me peyayekî baş e. Ez li ber wî geriyam da karekî bide we, lê kar tunebû.

Memed:

– Spas, çawan be em ê ji xwe re karekî bibînin.

Zero stûyê xwe xwar kir.

– Xwedê bike, got.

Rojê weke komek bizot, tîrêjên xwe berda herçar alî û spîsor derket.

Di rê de kamyonên bi bar, traktorên ku erebeyên naylonî avêtibûn dû xwe, erebeyên hespan, zadçin, jîp, otomobîlên axê, yên modelên dawî ku dibiriqîn, bi refan paleyên stûxwar derbas dibûn. Heta niha hume guma ku li Çûkûrovayê nehatibû dîtin der û dor dagirt. Hey û hûyek ecêb hebû.

Siyên wan ên dirêj di pêşiya wan de dimeşiyan û ser û binê wan di tozê de mabûn. Li milê rastê, jinek rûnixumandî dîtin. Jineke weke miriyekê, parsûyê wê ketibûn hev û di nav wê zeviya piçûk de hêdî – hêdî dizîvirî. Ne sîwanek hebû, ne jî holikek.

Ewrekî ji tozê li hewa çêbûbû. Ew di nav toz û dûxanê de

dimeşiyan. Toza ku dida gîzoka wan, lingê wan dişewitand. Ew hêrs bûn, her yekî di tenga xwe de xeber dan. Her ku diçû Ûsiv bêhaltir dibû.

Çûkûrova di bin erdê keve, gotin.

Siyên wan kişiyabûn binê lingên wan. Tî bûbûn. Di havîna Çûkûrovayê de av ji ku hatiye? Zimanê wan bi eznianê devê wan ve zeliqî bû. Bi hêviya ku ew ê avê bibînin, meşiyan.

Li wan deran ne gund hebûn, ne jî tu tişt...

Bi refan pale di ber wan re derbas dibûn, bi keder, westiyayî, mehfbûyî, stûxwar, destên wan li ser newqên wan, ji tozê tenê çavên wan dixuyîn, diranên wan dibiriqîn. Bi gepên xwe yên kortbûyî, goreyên neqişandî û qetiyayî li wan, peyayên ku ji piştên wan xwêdan diherikîn... Silav dan û silav girtin.

Roja li eznên, mêjiyên wan dikeland, ew mehû kiribûn. Ji aliyekî tîbûn, ji aliyekî westandin, ji aliyekî ve jî acizbûn.

Ji dûr ve, ji aliyê dengê zadçinê ê wî alî, cotkarek dîtin.

Aşik Alî:

– Haydên, got, em herin wir. Heger av bi wî re hebe ew ê bide me. Pê li pûşê ku zadçinê diavêt vî alî û wî aliyî kirin û derbas bûn. Ji roja ku li pirêzê û qirşikan dixist, mirov nikaribû çavên xwe vebikira. Wan nikarîbûn çavên xwe vekirana û binihêrîna. Wan ji dûr ve silav dan.

Mêrik, jina xwe û digel herdu keçên xwe yên donzdeh salî hespên xwe spartibûn ber pûş û pûş bar dikirin. Ser çavên wan di tozê de mabûn. Mêrik gomlegê xwe ji xwe kiribû û bi tevgerek xurt pûş davêt, jin û zarokên wî jî ew pûş bi cih dikirin. Hespan serê xwe xistibûn nava pûş û kirtekirta wan bû pûş dixwarin. Mêrik melêva xwe ji destê xwe avêt ser pûş

û hat ba wan. Pirça sînga wî ya dirêj spî bûbû, damarên destên wî nepixî bûn. Wî bi pişta destê xwe xwêdana ser çavên xwe paqij kir.

Aşik Alî:

– Em tî bûne, got.

Mêrik ji kûpê di erebê de satilek av dagirt. Bi lez, bêî ku bîhna xwe berdin av vexwarin.

Aşik Alî:

– Em şewitîn, got. Em şewitîn, lê em neçûn ba vanên ku tirimpêlan dajon û me av ji wan nexwest. Ev mirovên ha bi min ecêb tên.

Bi çavekî piçûk li mirov dinihêrin.

Mêrik:

– Kerem bikin, rûnin, got.

Aşik Alî:

– Bi gora miriyan, got.

Husik:

– Navê te bi xêr?

Mêrik:

– Navê min Xelîl e, got.

Hûsik:

– Ev Aşik Alî ye, ev Memed e, ev jî Memed e, ev Ûsiv e û ez jî Husik im.

Mêrik:

– Kar tuneye, got.

Aşik Alî:

– Em nû hatine, em li kar digerin, got.

Memed:

– Maşalê em karekî bibînin.

Mêrik:

– Êdî ji me re nan nemaye.
Aşik Alî:
– Ez şaş mame, got.
Mêrik:
– Axê xeber şandiye, gotiye, bes e ev li ser pişta min dijîn. Gotiye, ev sî sal in, ku ew van erdên min weke malên bavê xwe dajon. Gotiye, bila êdî ji nav erdên min derkevin,
Axê gotiye, bes e êdî ya ku ez ji destên wan dikişînim. Ji me re nema diqede, divê mirov kîsek kevir bi stûyê xwe ve girê bide û xwe bavêje avê. Jê pê ve tu rê nemaye.
Aşik Alî:
– Ev tiştekî ecêb e, got.
Mêrik:
– Ev sî salên min in, ku ez vî erdî dajom. Di ber bostek vî erdî de golek xwêdana min heye. Min digot, ê wisan here. Min digot, qey em ê her û her karibin erdê axê ji xwe re deman bigirin. Min mala xwe xerab kir û wisan bawer dikir. Ji xwekuştin û xwebidardekirinê pê ve tu çareya min nemaye. Ev zilm e...
Aşik Alî:
– Ne zilm e, mirin e, got.
Mêrik:
– Mirin e, got. Ji mirinê jî xerabtir e. Ew ê sibehê motora sor bîne bixe nava erd... Di her bostekê de golek xwêdana min heye.
Aşik Alî:
– Rast e, got. Ji mirinê jî xerabtir e.
Mêrik:
– Ez ê ji niha û pê ve bikarim çi karî bikim?
Ez ê bêyî erd bikaribim çi karî bikim. Zilm e. Yên we dî-

san zad neqede jî, erdên we hene, cih û warên wan hene...

Aşik Alî:

– Heye, got.

Husik:

– Xwezî tunebûya, got.

Aşik Alî:

– Wa mebêje, heye, got.

Mêrik:

– Bila yê min jî maleke ku min serê xwe têxistayê û pariyek erdê min hebûya, bila ez ji birçîna bimirama. Ax, ku yê min jî... Niha ez ê çi bikim? Ax, ev gawirê Amerîkayê, ax, ev muhendîzê mareşal... Zilm e...

Aşik Alî:

– Gava deriyek tê girtin, yekî din vedibe...

Mêrik:

– Bila venebe, got.

Aşik Alî:

– Çawan be wê vebe.

Mêrik:

– Deriyên ku vebin nemane, hemû hatine girtin.

Aşik Alî:

– Wê vebe.

Mêrik:

– Gava hûn di vir re hatin we dît. Jinekek heye, bi tena serê xwe cot dike.

Aşik Alî:

– Me dît.

Mêrik:

–Berî niha bi sê salan lingê mêrê wê di ber patoza axê de ma. Jinik bi sê zarokên xwe ve li vê deştê ma. Zarokên bi ta-

yê, zarokên bi êşa zirav... Axê ji wan re jî gotiye, ji nav erdê min derkevin. De bila Xwedê deriyekî veke... Ma deriyên ku bêne vekirin mane?

Aşik Alî:

– Ez çi zanim, got, Xwedê gewriya ku qul kiriye vala nahêle.

Mêrik:

– Bila vala bihêle, got.

Husik:

– Wer vala dihêle ku...

Zarokên ku li ber siya telîz razabûn, giriyan.

Mêrik:

– Keçê, got, werin bîskê bîhna xwe berdin.

Jinikê û herdu keçikên xwe melêvên xwe danîn û hatin ba wan. Rûyê keçikan wek bizotên êgir sor bûbûn. Piştî ku têr av vexwarin, hatin û rûniştin. Jinikê rahişt zaroka xwe, pişta xwe da wan û pêsîra xwe xist devê wê.

Aşik Alî:

– Rabin zarokno, got, em alîkariya hevêl bikin.

Ji bilî Ûsiv hemû rabûn. Di hundirê saetekê de hemû pûşê gidîşê avêtin û hatin li binê holikê rûniştin.

Mêrik:

– Xwedê kêmaniya we nede birano, got. Jinikê jî ji meşka ku bi mirdiyaqê holikê ve bi dardekirî bû dew derxist û dawerivand.

Gişan vexwarin. Gava ji hev veqetiyan mêrik:

– Hûn kêmaniyê nebînin, got. Maşalê hûn ji xwe re karekî bibînin.

Piştî ku ji mêrik veqetiyan bi saetekê bû. Roj diçû ava, lê dîsan jî der û dor di nava germê de vedigevizand. Li kêleka

rê dareke tûyê ya bi emir, ku pelên wê ji tozê spî bûbûn, hebû. Li ber siya wê darê jî, traktorek bi erebeke naylon ya ku di tozê de mabû, sekinî bû. Li ba traktorê tu kes tunebû. Ew hatin li hember traktorê sekinîn.

Husik nêzîkî motorê bû, ku destê xwe pê bike, lê Aşik Alî:

– Meke Husik, got. Nêzîk mebe. Çi dibe çi nabe!

Husik xwe bi paş de vekişand.

Demeke dirêj ew wilo li dora traktorê çûn û hatin û li her derê wê nihêrîn.

Memedê Zarok:

– Binêrin, binêrin, got. Çavên wê yên mezin jî hene. Binêrin, çawa dibiriqin!

Husik:

– Bila tunebûna, got.

Aşik Alî bi hêrs:

– Bikeve û bimire, got. Tiiif...

Wî devê xwe tije xwezî kir û avêt motora bi toz. Tifa wî riyek sor vekir û heya bi jêr herikî.

Ûsiv:

– Çûkûrova di bin erdê keve, motor di bin erdê kevin, got. Tiiif...

Memedê zarok hebekî ji motorê bi dûr ket, li paş xwe zîvirî û got:

– Mîrat, mîrat, înşaleh tu ê bimirî. Tiiif...

Tifa Memedê Zarok negihîşt traktorê.

Ji hemberî wan zilamekî bi şelwerê heya bi çongan qetiyayî û perîtî dihat. Mêrik xwas bû. Wî destmalek kevin li serê xwe gerandibû û di bin wê lihêfa li piştê, pişta wî tewiya bû. Gava ku wî pê li erdê dikir, te digot qey ew pê li sêleke sincirî dike, tavilê lingê xwe ji erdê radikir. Ew bi ecêbek kesnedî

dimeşiya. Ew ziwa bûbû. Gava mêrik di ber wan re derbas bû, ew li wan hayî jî nebû. Wî ne silav da wan û ne jî tiştek got.

Husik:

– Tu wilo bi ku de diherî birawo? got.

Weke ku mêrik ji xewê şiyar bibe, ji xwe aciz:

– Ez diherim cehenemê, got.

Husik:

– Te rast got, ji xwe ev rê rast diçe wir.

Mêrik an nebihîst, an jî bihîst lê guh nedayê, derbas bû û çû.

Aşik Alî:

– Vê meke Husik, got. Guneh e birawo. Ma te rewşa mêrik nedît? Tu pix bikê wê ruhê wî di pozê wî re bavêje. Tu ji xelkê belengaz çi dixwazî? Ma te rûyê wî nedît? Ew mehû bûye, miriye.

Husik:

– Min tişt negot, ku...

Aşik Alî:

– Guneh e, got. Mirov ji peyayên wilo re bibêje keko, wek mirov ji diya wan re xeberan bide.

Piştî demeke kurt ew traktora ku li bin siya darê bû, toz û dixan li nav hev xistin û ji wan derbas bû.

Husik diranên xwe qiriçandin:

– Bimeşe, got. Bimeşe. Ya ku nên dibire, ya ku malan wêran dike, bimeşe.

Memed:

– Înşaleh em ê kar bibînin, got. Dilê min weha hukum dike. Ger em kar nebînin qet çê nabe. Divê em bibînin.

Ûsiv têê li dawiyê mabû. Memed li paş xwe zîvirî û li wî

nihêrî. Ûsiv di nav toza li ser rê rûniştibû. Mîna ku wî nimêj dikir, daqûl dibû û radibû ser xwe.

Memed:

– Çi bi vî Ûsivî hat? got.

Aşik Alî:

– Xwezî ew nehata. Rewşa belengazo ne î baş e.

Husik hêrs bû:

– Ma bi vê qûnê mirov kare were Çûkûrovayê? Gawirê dêhn, hem ew dev davêje Çûkûrovayê, hem jî bi dû me de tê. Kûçik lawê kûçikan!

Aşik Alî:

– Husik, weha meke birawo, got. Weha meke. Deriyê nên e. Bi niyeta ku ew çend quruşan kar bike her tişt da ber çavên xwe û hat. Ma qey ew bi xwe nizane ku ew di çi rewşê de ye? Wê çi gûyî bixwe, tunetî...Tunetî kirasê ji êgir e.

Husik:

– Bila segbav nehata...

Ew gihîştin ber Ûsiv.

Aşik Alî:

– Rabe keko, got. Ma çi bi te hatiye?

Ûsiv bi nalîn:

– Damarên çongên min hatine birîn. Ez nikarim bimeşim. Dilê min wer lêdixe, ku...

Aşik Alî rabû, bi milên wî girt:

– Rabe keko, got. Wê niha derbas bibe. Evqasî qels mebe.

Ûsiv jî:

– Wê derbas bibe, got. Hertim wilo dibe, hertim mirov...

Piştî demekê ew rabû ser xwe.

Êdî dibû êvar. Roj dadiket paş çiyan. Dora ewrên spî yên rojhilat dibiriqî. Hebekî wê de erdekî birincê dixuya. Li nav

erdê birincê legleg li ser lingekî rawestiyabûn û difikirîn. Dibû ku jî ew razabûn. Birinc bi qasî tiliyekê bilind bûbû. Di bin re aveke zer diherikî û li cihokekê kom dibû. Aveke zer û girrikî...

Husik xwe daqûlî ser cihokê kir, devê xwe xist avê û vexwar.

Ûsiv bi lez bang wî kir:

– Husik, Husik, vemexwe birawo! Ev av hemû jehr e, vemexwe! Tu ê pê bimirî. Çi dibe bira, vemexwe. Ez bi vexwarina vê ava ha ketim vî halî.

Husik guh neda wî. Wî têr vexwar. Dû re Aşik Alî, Memed, Memedê Zarok, gişan av vexwarin.

Ûsiv her li ber wan digeriya:

– Jehr e, got, mirin e, got, zar û zêçên me hene got. Pere nekir.

Wan pişta xwe dan cihokê û rûniştin. Ûsiv îdare nekir, wî jî devê xwe xist ava cihokê û têr vexwar.

Husik:

– Ew çi ye Ûsiv? got.

Aşik Alî peyva wî ji dev girt:

– Husik, destê mede, got. Dest belengêz mede.

Memed:

– Înşaleh em ê kar bibînin... Dilê min weha hukum dike. Ger em nebînin nabe.

Husik:

– Em ê bibînin, got. Em ê karekî pir baş bibînin... Ma qey te di xewna xwe de dîtiye?

Memed:

– Dilê min weha dibêje.

Memedê Zarok:

– Dilê min jî... Ga... qulonç çengel...
Husik:
– Bibire, got. Bibire segbav.
Aşik Alî:
– Dest lêwik mede.
Husik:
– Mirov dêhn dike, got. Em nên bi dest naxînin ew di derdê gayan de ye.
Aşik Alî:
– Cahil e, got. Zarok e. Ma qet cahiltî di serê te re derbas nebûye?
Husik:
– Derbas bûye, lê ne ga, min di emrê xwe de ciwange nedîtine.
Aşik Alî:
– Ew jî weke te ye, got.
Husik:
– Oof Aşik, tu jî...
– Ê wa ye.

Bû êvar, der û dor tarî bûn. Te digot qey asman ji stêrkan hatibû raxistin. Stêrk wilo pir bûn ku mirov digot qey asman hemû stêrk in.Wawîk dikewtiyan.

Lihêfên xwe kirin behlîf û xwe dirêj kirin. Birrek kelmêş, wek ewrekî reş hat û li ser wan kom bûn. Gezên kelmêşan wek derziyan di laşê wan de radibûn. Wan ew vir de û wê de qewirandin, ne bû, ew kuştin ne bû. Her cihên ku kelmêşan xwe lê datanîn, dinepixî. Wan dest pê kirin û xwe xurandin. Xirte xirta wan bû û xwe dixurandin.
Ûsiv:

– Rawestin, got. Hûn nikarin razên. Heta sibehê ew ê me perçe bikin. Kelmêşên vir weke kûçikan bi mirov digirin. Çara wê nîne, divê em agirekî dadin. Ew nayên êgir. Nayên dixanê.

Husik:

– Rast e, got. Ez jî zanim. Ez jî havînekê li Çûkûrovayê mabûm.

Wan çûn hemêzek pûş ji gidîşa kêleka Husik anîn û li ortê danîn. Paşê kibrît vêxistin û dan binî, agir bi carekê ve gurr bû.

Hebekî wê de riya spî, ya weke şerîtekê zirav rohnî bû. Ava cihokê xuya bû. Gava wan Ûsiv di şewqa êgir de dîtin, tirsiyan. Ew zer û hişk bûbû. Goştê rûyê wî kişiya bû. Devê wî ji hev mabû.

Husik:

– Kelmêş nayên şewqê, em ê heya sibehê wilo vêxin, got.

Aşik Alî:

– Em ê vêxin.

Husik:

– Kelmêşên Çûkûrovayê... got.

Aşik Alî:

– Qet mebêje, got. Lawikekî feqîr hebûye...

Husik:

– De bêje Aşik, got. Çirka ku em hatine Çûkûrovayê ne te stranek gotiye, ne jî te li tembûrê xistiye.

Aşik Alî:

– Weha bû.

Ûsiv:

– Aaay, got, naliya.

Aşik Alî:

– Înşaleh wê derbas bibe keko, got.

Husik hemêzek pûşê din jî anî û avêt ser êgir. Ji aliyekî ji ber germa hezîranê, ji aliyekî jî ji ber germa êgir, ji rûyên wan dilopên xwêdanê diherikî.

Husik:

– Aşik Alî, ya ku te bîska din dest pê kir, bibêje, got û destê xwe li milê wî xist

Aşik Alî tembûr xist destê xwe, piştî ku kok kir:

– Ji wê hêla me lawikekî feqîr hebûye... Dilê wî ketibûye keçikekê. Bavê keçikê keçik nedidayê. Gotiye bila du hezar lîre bîne, bila hingî keçikê bibe. Lawik feqîr bûye, xwas û tazî û hewcedarê pariyek nan bûye. Bi sala bi dû keçikê ketiye. Çawa ku lêwik ji keçikê hez dikir, keçikê jî ewqasî ji lêwik hez dikir. Şevekê lêwik bi destê keçikê girtiye û gotiye, bimeşe em herin Çûkûrovayê. Ew hatine Çûkûrovayê. Lawik zaro bûye. Bi roj xwe vidişartin û bi şev jî dimeşiyan. Ew ditirsiyan ku hukûmet wan bigire û wan ji hev veqetînin. Bavê keçikê zengîn bûye. Dest û ling dirêj... Lawik bi rojan keçik baş vedişart û bi xwe jî diçû ji gundan nan dida hev. Rojekê dîsan lêwik keçik di kortaleke di nav erdê birincê de veşartiye û çûye ji gundan nên bide hev. Piştî ku roj çûye ava û şev tarî bûye, ancax ew gihîştiye kortala ku keçik tê de veşartiye. Nihêriye ku keçik ne li cihê xwe ye. Geriyaye negeriyaye, keçik nedîtiye. Heta sibehê li wir çûye û hatiye. Wî heta sibehê hêsirên ji xwînê rijandiye. Cenet, Cenet! heta bi sibehê bang kiriye. Gava dinya rohnî bûye û gawir û musulman ji hev ferq bûne, ew ji xwe re çi bibîne! Di kortalekê de komek hestiyên spî... Ji aliyekî jî guliyên keçikê weke marekî reş, li aliyê din jî kincên keçikê yên perçe perçe...Gava lawik vê yekê dibîne serê xwe winda dike. Dibêjin ku kelmêşan keçik

perçe kiriye, kelmêşan keçik xwariye. Guneh di stûyê yên ku dibêjin de...

Husik:

– Rast e, got. Ger niha agir tunebûya ma qey wê kelmêşan em jî perçe nekirana?

Memed:

– Wan ê em bi saxî bixwarana.

Aşik Alî:

– Lawik li hemberî hestiyên spî rûniştiye, guliyên wê xistine destên xwe û stranek gotiye.

Husik:

– De, got. De ez heyrana çavên te bim Aşik.

Aşik tembûra xwe xist nav destên xwe û xwe bi ser tembûrê de tewand. Lêxist, tembûr peyivand û wî jî got. Dengekî Aşik hebû, wek dengê Veysel, mirov dişewitand. Aşik got û yên din di cihên xwe de sar man. Ji devên wan ji "ax"ê pê ve tiştek dernediket.

Aşik Alî:

– Weha, got. Lê lêwik guliyên keçikê yên şîrikî xistine destê xwe û ketiye nava gundên Çûkûrovayê, ew li kê rast hatiye, derdê xwe jê re gotiye û kula dilê xwe jê re rijandiye, dil li wan perçe kiriye. Dûrî serê dijminan be...

Dûre Aşik tije bû. Tembûra xwe hemêz kir û xwe baş bi ser de tewand, bû bi qasî desteki, ew weke zarokekî pênc salî ma. Dengê wî yê gurr û xurt di tarîtiya şevê de pêl da û di hemû deştê de belav bû.

Ew radibû, dadiket, hêrs dibû, diqîriya. Wî li ser derd û kulan digot, li ser evînê, li ser mirinê, li ser tunebûnê, li ser êşa zirav, li ser tayê, li ser zar û zêçan, li ser tenêbûnê, li ser dûrbûnê... Li ser Kizilirmak, li ser Seyhanê, li ser Ceyhanê

digot. Li ser Çûkûrovayê, li ser mêşan, li ser gawirên motoran. Li ser dinya xerab, li ser çiyayên bi berf û keriyên xezalan digot. Li ser axan, li ser stemkariyê digot.

Heta bi berbangê got. Gava dinya rohnî bû û bayê sibehê yê hênik hat, wî hêdîka tembûra xwe danî kêleka xwe. Jê pê ve devê xwe venekir û ru tişt negot. Tenê rûyê wî rehet û di hundurê ronahiyeke dilşa de bû.

– Aşik, gotin. Xwedê nexweşiyê nîşanî te nede, tunebûnê nîşanî te nede. Ya ku ru destê xwe biavêjê bibe zêr.

Ew ji wir çûn. Agirê ku li dû xwe hiştibûn vêketîbû. Dûre agir winda bû. Ji dûr ve tenê dixaneke zirav xuya dikir.

Gundê ku ew tê re derbas bûn, navê wî Akköy bû. Gund xerabe bû. Kozikên ku bi rêxê hatibûn seyandin, qamîş li ser nema bûn, hema ew wilo spartibûn girik. Bi dû wan de keriyek kûçik dihat. Gava ku ew di ber xirbeyekî xerabe re derbas bûn, kalekî çavbişîlaq û piştxûz bang wan kir:

– Merheba.

– Merheba, wan jî gotin.

– Hûn ji ku tên û hûn ê bi ku de herin? mêrikê kal ji wan pirsî.

Memed:

– Em ji Urumê tên û em li kar digerin.

Peyayê kal:

– Kar di devê piling de ye, got. Ku tu karibî bistînî, bistîne.

Memed:

– Înşaleh emê bibînin.

Kalo:

– Çûkûrova ne ew Çûkûrovaya ku tu pê dizanî, erd û ezman bûye traktor.

Aşik Alî:

– Wê Xwedê li feqîr û belengazan were rehmê, got.

Kalo:

– Amîn, amîn, li me hemiyan...

Memed:

– Di xweşiyê de bimîne, got.

Kalo:

– Zadekî Weliyê me heye, raza ye, got û kete riya wan. Zadê ku radizê makîne nikare biçine. Hûn çiyayî paleyên baş in.

Memed:

– Em pir baş diçinin.

Husik:

– Em diçinin

Memedê Zarok:

– Ez jî diçinim, got. Qulonçê dasînî, weke heyvê.

Aşik Alî:

– Tu jî diçinî, got. Çima tu ê neçinî, çiyê te kêm e?

Kalo zarokek xist pêşiya wan û ew şandin mala Welî.

Lawik:

– Apê Welî, got. Bavê te ev şandine, ew ê zadê te biçinin. Ev baş diçinin. Bavê te wilo got. Ev eynî weke bîçerê ne. Yaaa...

Dûre wî şelwerê xwe yê reş û qetiyayî ber bi jor ve kişand û ji wir bi dûr ket.

Welî:

– Baş e ku hûn hatin, got. Zadê min bi erdê ve bûye yek. Makîne nikarin biçinin. Tu makîne nikare biçine.

Memed:

– Em karin biçinin.

Welî:

– Hûn ê bi çiqasî biçinin?

Aşik Alî:

– Hela carekê em erd bibînin.

Piştî ku wan avek vexwarin, ew çûn nav erd. Zad bi qasî bîst donim genim bû. Ew weke hesîlê li erdê hatibû raxistin. Similek jî li ser xwe nemabû.

Aşik Alî:

– Wax, got, mehû bûye.

Welî:

– Gava Xwedê nede nade, got. Ger piling têketa nava vî erdî nikarîbû wilo bikira. Qismet e, genimê weke qamişan raza ye. Baş bû ku hûn hatin.

Ji bo çinîna wî bîst donimî bi bîst lîran li hev kirin. Wan zûka dasên xwe derxistin û ketin nava erd.

Memed:

– Min ji we re negot, em ê kar bibînin? Dilê min wisa hukum dikir. Li vê Çûkûrovayê binihêrin, mîna dinyayekê ye. Çawa kar tuneye! Tenê ku mirov bixwaze kar bike.

Herkesî dest bi kar kiribûn. Hela belaya wan bûn û diçinîn. Ûsiv serê xwe xistibû nav çongên xwe û li ser qûçekê rûniştibû. Memedê Zarok rahişt dasa Ûsiv. Gava Welî ket riya malê da here ji wan re xwarinê bîne, Memedê Zarok bi dizî nêzîkî wî bû.

– Apo, got, tu ê heqê min jî bidî min? Gayên qulonçdas...Wî xweziya xwe daqurtand.

Welî şaş ma. Berê xwe bi yên ku zad diçinîn vekir:

– Ev çi dibêje wilo, dêhn e çi ye?

Aşik Alî:

– Guh mede wî, got. Ew zaro ye.

Memedê Zarok bi hêrs ber bi berê genim ve çû.

Husik:

– Te çi ji Welî axa re got kuro? Kuro lawê kûçikan...

Aşik Alî:

– Ma wê çi bibêje. Hebe tunebe wê li bejmara traktorên ku li Çûkûrovayê hene pirsî be. Ma wekî din wê çi bipirse? Ne wilo Memed?

Memedê Zarok:

– Ji xwe min jî ew pirsî, got.

Heya piştî nîvro bêî ku piştên xwe rast bikin, çinîn. Ji germa rojê leylan li ser wan rabûbû. Çinîna genimê razayî ne weke çinîna genimê li pê ye. Pişta mirov dişikîne.

Dema firavînê Welî ji wan re satilek şorbe anî ser erd. Ew rûniştin û şorba xwe bi îşteh xwarin. Lê Ûsiv pariyek jî nexwar. Hevalên wî kirin nekirin, li ber geriyan negeriyan, şorbe bi wî nedan xwarin.

Piştî xwarinê, bêî ku ew westa xwe bigirin, wan dest bi çinînê kirin. Ew lê vebûbûn, bi awayekî diçinîn ku bîçerê li ber wan gû dixwar.

Nêzîkî roava bû, nihêrîn ku Ûsiv hat, bi hêrs dasa xwe ji destê Memedê Zarok girt û dest bi çinînê kir. Her derê wî diricifî.

– Tu nexweş î, meke Ûsiv, gotin. Tu ê bi vî awayî xerabtir bibî. Tu ê vê havînê li Çûkûrovayê perîşan bibî. Tu meçine. Em ê di nava xwe de parekê bidine te jî. Em ne ker in, qey em jî camêr in.

Ûsiv qet deng nebir xwe. Serê wî di ber wî de bû û helke helka wî bû diçinî. Dûre ji nişkê ve ket xwarê, dasa wî ji destê wî ket.

Aşik hat, Ûsiv ji erdê rakir.

– Meke keko, got. Tu nexweş î.

Ûsiv ji nava erd derxist, li paş xwe zîvirî.

Husik pir hêrs bû:

– Şeytan dibêje rahêje dasa wî û di nava serê wî de lêxe, çi dibe bila bibe. Kuro segbav, tu zanî ku tu nexweş î, tu mirî yî, çi ji te re ku tu bidî dû me û werî van deran? Li cihê xwe bisekine, li gundê xwe bimîne, bela serê me. Tu çi ji me re dibî bar... Ji xwe em...

Aşik Alî:

– Husik, got û hêrs bû.Tu ji vî belengazî çi dixwazî Husik? Ew ne nanê me dixwe, ne jî ava me vedixwe. Tu ji vî zilamê nexweş çi dixwazî birawo? Ji xwe Xwedê lêxistiye, ma em jî lêxin.

Husik:

– Bila bisekine, got. Bila li cihê xwe bisekine. Tê genim jî diçine! Dimire! Genim jî... Ma ne ew bû yê ku digot, Çûkûrova cehenem e û riya me dibirrî? Niha jî...

Wan heta bi roava çinîn. Lê xelas nekirin, dasên xwe xistin ber piştên xwe û vegeriyan gund. Bayê xerbî bi hemû hêza xwe dihat. Welî merşek li derve raxist û ew li ser rûniştin. Li kêleka wan, çêlekê devê xwe xistibû nav giha hêşin û dixwar. Devê golika wê di guhanê wê de bû û şîr dimêt. Bêhna gihayê li wan der û doran belav dibû.

Welî siniyek mezin tije savar, anî û li ber wan danî. Savar rijî bû, lê guh nedanê, bi îştah xwarin.

Jina Welî nuh zaro jê re çê bûbû, ew li hundir razayî bû. Li kêleka wê jî zaroka wê ya nûzayî li ser seradê razayî bû. Sê zarokên Welî yên din jî hebûn. Hersê jî nexweş, bi tayê bûn. Hemû diricifîn. Gava Memedê Zarok hatibû hundir, wî hingî ew li hundir dîtibûn.

Ûsiv şîv jî nexwar. Diranên wî bêhawe li hev diketin. Mirov digot qey hesp di riyên bi kevir re diçin. Hertim jî wî axîn dikişand.

Husik:

– De, digot. Ez niha çi bikim? Wê ev zilam min dêhn bike. Li vê germa Çûkûrovayê nexweşî ji me kêm bû.

Aşik Alî:

– Tiştê ku wê bibe dibe. Mirov nikare pêşiyê lê bigire. Em ê bikişînin birawo, ma wekî din çi ji destê me tê...

Welî nivînê jina xwe li ber dikê raxist. Nivînê zarokan jî li ber ê wê raxistin. Bayê xerbî toza li ser nivînan dimalişt.

Palan jî lihêfên xwe vekirin û ew li ser merşa di bin xwe de raxistin. Yên din razan, lê Aşik Alî û Welî hişyar mabûn û dipeyivîn.

Welî:

– Bila erd ji min bistîne, bila bistîne, da ez jî xelas bibim... Tu bixebite, bixebite, diran nemîne, neynûk nemîne, dest nemîne, ling nemîne û nêviyê wê bide yê ku kar nake, ma wilo dibe? digot. Tune, tune, ji vê çêtir tune. Mirov birçî bimire çêtir e. Bila ew erd ji min bistîne da ez jê xelas bibim.

Aşik Alî:

– Weha mebêje birawo, digot, li hember derdiket. Tu şaş î. Erd cihê ye.

Welî:

– Rast e, ku erd yê te be baş e, lê yê xelkê be tu ê wilo bibî kole. Ev keda min xwîn e. Haya wî tew jê nîne. Binihêre, tu rewş û pergala min dibînî. Bila erd ji min bistîne da ez xelas bibim. Ji xwe wê bistîne. Çirka ku traktor hatine, yên ku erd deman dikirin ji navê rabûn. Bi tenê ez mame. Bila ez bimirim û jê xelas bibim. Çi dibe bila bibe, jiyan ev be...

Welî hîna jî got. Ew kufur bû, wî xeber da, lê Aşik Alî wer ku westiyabû, ew di xew re çû. Wî hew gotinên Welî bihîstin.

Wan roja dudan, piştî nîvro zad hemû çinîn. Perên hûr ji Welî xwestin û weke biran li hev par ve kirin. Ûsiv pere nedixwest. Aşik Alî belkî zêdeyî saetekê li ber wî geriya ta ku bi zorê para wî xist bêrîka wî.

Gava ku pere ket destê Memedê Zarok gelekî kêfa wî hat. Wî pere xistin destên xwe, di ser hev re qulupandin, lê nihêrî, xist bêrîka xwe, dîsan derxist. Dû re da Memed. Lê paşê dîsan bi paş de jê xwest. Dû re dayê, dîsan jê stend. Dawiyê xist bêrîka xwe û destê xwe qet ji bêrîka xwe dernedixist. Carê ew pere ji bêrîka xwe derdixist û lê dinihêrî. Çû ba Memed:

– Apê Memed, got, ez ê cotek ga bikirim, cotek gayên qulonçmezin, ez ê bibim welêt...

Husik ji Memedê Zarok pir hêrs bû, wextî lê bixista, lê Aşik Alî nehişt. Dû re li Memedê Zarok zîvirî:

– Lo Memed, got, tu jî evqas dinya nedîtî mebe, lo!

Memed:

– Ma min ji we re negot, em ê kar bibînin, em ê peran qezenc bikin. Em ê îsal pit peran bidin bev. Dilê min wisa hukum dike.

Jina wî, zarokên wî û bizina spî jî qet ji bîrê nediçû.

Ji wê pê ve ew li her derê Çûkûrovayê geriyan. Wan pirr tişt dîtin. Pirr tişt bi serê wan de derbas bûn. Gundên ku neçûnê, axayên ku xwe neavêtinê, neman. Çûkûrova beroş, ew jî çoçik, bimeşe bavo bimeşe. Ew her geriyan. Rojekê gava di mêrgekê re derbas bûn, ew heya qirikê di herriyê de man. Şoferê traktorekê ku ew xelas kirin, ji wan re behsa wê avzêl-

kê kir.

Li deştê gelek pale bêkar digeriyan, paleyên fena wan birçû û belengaz. Hemû jî weke wan şaş mabûn. Di riyên ku tozê dida çongên mirov de traktor, zadçin û kamyonên şîn, zer, sor û şîrkî derbas dibûn. Li ser wan bi qasî nîvtiliyê toz girtibû. Ji tozê qet rengê makînan xuya nedibûn.

Deşt bemû ji tayê diricifî. Rûyê mirovan yên zer dirêj bûbûn.

Giha hişk bûbû, pel li şaxan çilmisîbûn. Ser û binê deştê ji germa zer bûbû. Wan miriyên ku di riyan de mabûn, dîtin. Berêvarekê, miriyê ku ew lê rast hatin, di nav toza rê de mabû. Rûyê wî yê ku di bin tozê de xuya dikir, weke kehribarê bû. Çîmên wî rep û lingên wî dîk bûn. Piştî hatina traktoran, mirov bi carekê ve hatibûn guhertin. Ew tewlo mewlo bûbûn. Wan li rûyê mirov jî nedinihêrîn.Van makîneyên ku nizanîbûn bê wê çi ji wan re bike, ji wan re bûbûn weke pûtan.

Li gundekî axayekî xort bê sebeb tif kir wan, ji dê û jinên paleyên bêaqil, ku ji çiyan hatibûn Çûkûrovayê re xeber û gotinên nemayî kirin. Ger Aşik Alî bi Husik negirta wê Husik mêrik ji hev perçe bikira. Wî ji kerban serê xwe li dara tûyê, ya li ser rê, ya ku pelên wê di tozê de mabû, dixist, digiriya, dinaliya û xeberên nebaş ji Çûkûrovayê re dida.

Wan hîn gelek tiştên din jî dîtin, tiştên nedîtî di serê wan re derbas bûn. Ew du rojan jî birçî man. Ger ne ji Aşik Alî bûya rewşa wan xerab bû. Ew li gundan geriya, li tembûrê xist û nan dan hev. Ger wek berê bûya, wan ê Aşik Alî li ser destên xwe bigerandina. Niha tew li rûyê wî jî nedinihêrîn. Berê xwe davêtin Aşik Alî, li ber wî digeriyan, ji bo ku li deng û tembûra wî guhdarî bikirana.

Ew di tozê de mabûn. Xwêdana ku ji laşê wan diherikî tevlî tozê dibû û dibû herî. Mîna ku ew ji nav çiravê derketibûn.Tiştê ku nedîtibûn, dîtin. Tiştê ku nekişandibûn, kişandin. Aşik Alî li ser derd, li ser tunebûnê, li ser riyên bi toz, li ser axayên zalim, li ser kelmêşên bi hestî yên ku weke maran bi mirovan vedidan stiran gotin. Yên ku dengê Aşik dibihîstin, dilê wan perçe dibûn, di nava kul û kederan de diman.

Em bên ser Ûsiv, ne ez bibêjim, ne hûn bibihîzin! Ji wê re dil debar nake. Ku dilê mirov kevir be jî wê ji ber rewşa wî bihele. Ew du hefteyan bi wê belengaziya xwe bi dû wan de dikişkişî. Yên ku li her aliyên xwe agir dadidan, bê hiş diketin û yên ku weke berfa zozanan diqerisîn. Piştî du hefteyan êdî ew nikarîbû bimeşiya. Wî nan nedixwar, lê bêî navbir ava Çûkûrovayê ya şîrgerm, a mîna xwînê vedixwar. Ew tenê çerm û hestî mabû. Wan bi dorê ew li pişta xwe dikirin. Bêtir Husik ew hildigirt. Ji ber ku di nav wan de yê herî bi qewet Husik bû.

Ûsiv:

– Min bavêjin û herin, digot. Ez ji we re bûme bar. Bila ez jî wek wî miriyê ha li ser rê di nava tozê de bimînim.

Yên din guh nedidan wî.

Pêşî Husik hişyar bû. Destên xwe yên mezin kirin hutik û çavên xwe firkandin. Her derê wî dişewitî. Dû re Husik Aşik Alî hişyar kir. Dû re Memed... Ûsiv heya bi sibehê ranezabû, ew her ji ber êşa laşê xwe naliya bû. Niha jî ew hêdî hêdî dinaliya. Diranên wî jî weke ku bi hev ve hatibûn çengelkirin. Memedê Zarok jî destê xwe yê rastê xistibû bêrîka xwe û li ser raza bû. Razaneke wî weke ya zarokên biçûk hebû. Te digot qey wî nefes nedigirt.

Mîna ku êvarî baran bariyabe, avî ketibû, der û dor şil û

pil bûbû.

Çûkûrova hişyar dibû. Dîkên gundê li jêrî wan bang dan. Dû re dengên makînan batin. Paşê jî dengê mirovan. Dengên rojê tevlî dengên makînan bûn.

Paşê jî li erdê leylaneke zirav bilind bû, firêze biriqîn. Ji dûr ve, ji pişt Gawirdaxê topek şewq pijiqî.

Ji vî cihî re axa Yüregirê dibêjin. Ev axa Yüregirê teze ye, weke laşên jinan nerm û germ e. Tu can lê biçînî wê şîn were. Zadekî wê heye, dibêjin ku piling jî têkeve nav ne xem e. Ji yekê sih, ji yekê çil dide. Gava pembûyê Yüregirê derdikeve, hemû erda Yüregirê çilspî dixemile.

Husik bi pozikê sola xwe Memedê Zarok tevda.

– Rabe, got. Rabe kûçik lawê kûçikan. Tu heta bi nîvro radizê! Ev kûçikbav li serê min bûye Keklîkoglu.

Aşik Alî:

– Husik, got. Tu bi her awayê xwe baş î, lê xwezî ev adeta te tunebûya.

Husik:

– Binihêre, got, tu bi Xwedê kî Aşik binihêre bê ew çawa raza ye! Pere xistine bêrîka xwe, destê xwe jî xistiye bêrîka xwe û li ser wan raza ye... De were dêhn mebe! Tu dibê qey em hemû diz in.

Aşik:

– Her xuyên te baş in, Husik... Lêwik nedîtiye. Ne bi zorê ye... Nedîtiye.

Memedê Zarok bêî dilê xwe hişyar bû.

Êdî kêr gihîştibû hestî. Wan ji mêj ve biryar dabûn, ku vegerin. Lê Memed pêxîla wan bernedida. Her ku wan berê xwe bi welêt vedikirin ku vegerin gundê xwe, Memed ji dûr ve gundek didît,

– Hela em herin vî gundî jî, ew ê helbet li wir karek hebe, digot, li ber wan digeriya û ew dibirin wî gundî. Wilo, belkî wan deh caran berê xwe dan gundê xwe, ku vegerin, lê Memed berê wan hi gundên din vedikir.

Îro êdî dawî bû. Careke din veger tunebû. Kar tuneye, ew ê çi hê seheb û perîşan li Çûkûrovayê bigerin. Memed jî hêviya xwe birrî bû, stûyê xwe xwar kiribû.

– Em herin birano, ma çi ji destê me tê, em herin, gotibû.

Husik Ûsivê ku li erdê dinaliya rakir û li piştа xwe kir.

Ûsiv ji nişkê ve veciniqî.

– Min deynin. Êdî ez westiyam wer ku ez li piştên cihê cihê siwar bûm. Ez ji ber xwe fedî dikim. Ez ji we re bûme har. Min deynin. Ez ê hi xwe bimeşim. Min deynin. Wî lingên xwe li hêtên Husik dixistin. Min deyne! Ku tu min daneynî ez ê bimirim.

Aşik:

– Meke birawo, got. Ma ev rewşa te ya bi xwemeşandinê ye? Vê meke. Êdî va ye em diçin malê.

Ûsiv guhdarî nekir. Wî her digot, min deynin. Husik jî hêrs bû, ew danî û meşiya. Memed ket bin milekî Ûsiv, Aşik Alî jî ket bin milê din û hi dû Husik de meşiyan. Serê Ûsiv pê ve daliqyabû. Gava ew di nava wan de dimeşiya, lingên wî li hev digeriyan û huldukumî. Piştî ku ew demekê wilo meşiya, bi carekê ve êdî hew lingên wî pê ve hatin. Ger wan milên wî berdana, ew ê deverû biketa xwarê.

Memed bi lez ew girt û ew li pişta xwe kir.

Memedê Zarok:

– Ger ew min bikujin jî ez naçim ba Keklîkoglu. Ez ji birçîna bimirim jî ez dîsan naçim ba wî. Ne wilo apê Aşik?

Aşik Alî:

– Ger ez bi tenê bûma dinya hîç bû. Ez di şûna te de bûma ez jî nediçûm ba wî.

Memedê Zarok:

– Ew ne beqê min dide min, ne jî tiştekî... Ew bi lêdanê jî min dikuje.

Memed:

– Ez ê niha çawa li rûyê jina xwe binibêrim. Ez ê ji zarokên xwe re çi bibêjim? got.

Aşik Alî:

– Tu ê dîsan lîstikekê derxînî. Çavê te lê ye tu dîsan lîstikekê derxînî Memed?

Husik:

– A niha, a niha ku kar bebe û bêjin were bixebite, ez dîsan jî nasekinim, ez ê herim. Bes e êdî! Ev rezîlî û kepazetiya ba bes e. Ku Çûkûrovayê bi ax û kevirên wê, bi motorên wê û bi van tirimpêlên wê ve bidin min ez dîsan nasekinim.

Aşik û Husik di rex hev de dimeşiyan. Memed di bin Ûsiv de westiya bû û di pêşiya wan de dimeşiya. Serê Ûsiv bi aliyekî ve daliqyabû û bê deng bû. Aşik çû ba Ûsiv, daqûl bû û lê nihêrî.

– Husik, got, rewşa Ûsiv xerab e. Stûyê wî ketiye... Xwedê zane... Xwezî ew bigihîje gund û di nava zarokên xwe de...

Husik:

– Qet hêviya min tuneye, got. Ez bawer nakim ku ew bigihîje gund. Ez li ber dikevim ku wê Ûsiv li Çûkûrovayê bimîne...

Aşik Alî,

– Zor e, got.

Husik:

– Ger em wî bigihînin gund ew ê jina wî were pêşiya me.

Ew ê zarokên wî li ser serên me kom bibin. Ez ê ji wan re çi bibêjim? Ûsiv li ku ma? ew ê bipirsin. Ax, ku nemira... Ku ew nemira min ê qurbanek bida.

Dibû êvar. Ew bi meşê gibîştin ber erdekî pembo. Darikên pembo beta çavan çav didîtin, bi rêz bûn.

Memed Ûsiv danî û ew li ser piştê di nava erdê pembo de dirêj kir.

Aşik Alî eba xwe ji xwe kir û di bin Ûsiv de raxist.

– Bila feqîro li ser erda hişk nemire, got.

Ew li ser serê wî kom bûn. Ûsiv carinan çîpên xwe ji hev dikirin, diricifî, paşê dîsan dihat ser hişê xwe û tiştin ku nedihatin fêhmkirin digot. Çavên wî beloq bûbûn.

Memed:

– Aşik, li ser bixwîne, got. Bila feqîro bê dîn û îman neçe.

Aşik dest pê kir û xwend.

Ew wê şevê hetanî sibehê bêî ku çavên xwe nerm bikin, li ber serê Ûsiv rawestiyan. Ûsiv nemir, ew hebekî bi ser hişê xwe ve hat.

Husik Ûsiv li pişta xwe kir:

– Înşaleh ew namire, got. Înşaleh ew ê bigihîje welêt.

Wê rojê, li dor nîvroyê dîsan rewşa Ûsiv xerab bû.

Husik:

– Ez wî ji pişta xwe nakim, got. Ger ew bimire jî bila ew li pişta min bimire. Tu nemaye em bigihêjin Çûkûrovayê. Ger bêhna çiyan têkeve pozê wî ew ê jîndar bibe. Ez careke din wî ji pişta xwe danaxim.

Li milê wan yê rastê, di nava daran de gundekî xuya dikir.

Memed nêzîkî Aşik bû, bi milê wî girt:

– Aşik, got, tu guh nede wî dînî. Wê Ûsiv li ser pişta te bimire. Em nikarin wî di nava erdên pembo de veşêrin û he-

rin. Tu guh mede wî, were em herin vî gundî.

Aşik Alî:

– Çênabe, got, ger ew himire wê bimire...

Memed:

– Aşik, got, ma em ji bo çi hatin Çûkûrovayê? Em ji bo kar hatin. Wê Ûsiv bimire. Ger ew bimire jî bila li gund bimire.

Aşik:

– Ha ew li gund miriye, ha jî li vir miriye, ma ferqa wê çi ye?

Memed:

– Wê gundî meytê wî rakin, qet nebe wê wî li goristanê veşêrin.

Aşik Alî:

– Ez bawer nakim, got. Vir Çûkûrova ye, Ew çiyayiyan di goristanên xwe de venaşêrin.

Memed:

– Aha va ye em diçin. Em ê çawan destvala herin. Em ê ji xelkê re çi bibêjin? Em ê ji jinên xwe re çi bibêjin? Em ê ji zarokên xwe re çi bibêjin?

Aşik Alî:

– Ma em ê çi bibêjin, got. Me qezenc kir û da qumarê...

Memed:

– Kekê Aşik, got, ez têm dest û lingên te kekê Aşik, ev gundê ha bi dar û ber e. Ma te qet gundên wisa li Çûkûrovayê dîtiye? Dilê min ji min re dibêje. Were em riya xwe bi vî gundî bixin. Ji sedî sed wê li vî gundî kar hebe. Ger em li vî gundî jî kar nebînin wê çaxê serê min jê bikin.

Husik li pişt xwe zîvirî:

– Memed, bi sertî got, dîsan çavên te li gundekî ket. Ma tu

dîsan Aşik dixapînî? Hûn herin, ê min ez nayêm. Ya ku em dikişînin hemû ji ber vê înada te ye.

Memed xwe bi milê Husik ve girt.

– Binêre, keko, got, ew ê li pişta te wê bimire. Wê ev belengaz bimire. Qet nebe bila ew li gund bimire, bila ew di goristanê de were veşartin. Binêre, ma qet we gundên wilo li Çûkûrovayê dîtiye? Ew di nav daran de ye. Wê mutleq li vî gundî kar hebe. Ger em li vî gundî jî kar nebînin, wê çaxê serê min jê bikin. Qetla min ji we re helal e.

Paşê ew li Aşik Alî zîvirî:

– Kekê Aşik, got, tu guh mede vî dêhnî. Li vî gundî kar heye. Binêre, di nava daran de ye.

Aşik Alî:

– Ez çi zanim Memed, got. Ez çi zanim, xwezî kar hebûya...

Husik:

– Tu dîsan nerm bû yî, Aşik Alî, got. Wê çaxê li Çûkûrovayê şerpeze bibe.

Memed:

– Ez heyrana çavên te bim, Husik, got, binêre, bê çiqas dar li vî gundî hene. Muheqeq em ê li vir kar bibînin.

Husik:

– Ez nayêm, got. Hûn herin.

Gava yên din dimeşiyan, Memedê zarok li dû wan dima. Memed dît ku Memedê zarok li dû wan maye, wî bang kirê:

– Zû were vir.

Dengê wî pir bi hêrs bû. Lawik tavilê reviya û gihîşt wan.

– Ez ji we re dibêjim ku ev gund bi dar e. Li vî gundî kar haye. Ma we li vê Çûkûrovaya ku ji germa leylan jê radibe, qet gundekî wilo bi dar dîtiye? Ûsiv jî wextî bimire. Qet ne-

be hema ew li vî gundî bimira...

Dengê wî lerizî û girî kete qirikê. Te digot qey piştî kêliyeke din ew ê li vê deştê Ûsiv li ber xwe dirêj bike û stranên şînê biavêje ser. Ew di ber xwe de dipeyivî.

– Ma qey Ûsiv ne gundiyê me ye, ma me bi wî re nan û av nexwariye, ma qey nabe ku em wî li vî gundî veşêrin, li bin van darên hênik... Dibe ku jî li vî gundî meleyek hebe, bi dengê xwe yê zîz li ser Ûsiv bixwîne.

Her ku diçû germa rojê zêdetir dibû, ew ji gundê bi dar bi dûr diketin. Herçiqas lingên Memed ber bi gund ve dikişiyan jî, lê wî gotin nedixist serên hevalên xwe.

– Hûn nizanin bê Ûsiv lawikekî çiqasî baş e. Ma dibe ku ew li vê çola Xwedê bimire, ma qet dibe ku termê wî li vir, di bin vê germa dojehî de bihele? Ji xwe li vê germa han binerin, vê germa ku dişewitîne û dihelîne. Ma ne guneh e ku termê Ûsiv li vir bimîne?

Husik:

– Tu li Ûsiv mefikire. Ez ê wî bi mirîtî jî, bi saxîtî jî bibim serê çiyan, bibim ber avên hênik, bibim ser kehniyên sar.

Aşik Alî:

– Memed, got, kekê Memed, em evqasî geriyan, em evqasî li vê mîrata Çûkûrovayê geriyan, em evqasî li vê Çûkûrovaya ku dişewite geriyan...

– Lê ev gund bi dar e, Memed got.

Aşik Alî:

– Ger bi dar be...

– Binêre Husik, binêre Aşik Alî, binêre Memed tu jî Ûsiv...

Ew li orta rê rawestiyan. Gava ew rawestiyan Memed ji bîr kir ku wê çi bibêje, ew demekê fikirî.

Ew deşta ha ji vir heta derya spî dirêj dibû, her ku dûr dibû jî rengê wê şîn dibû û dirêj dibû.

Memed stûyê xwe yê dirêj ber bi Husik ve dirêj kir:

– Gava niha em bikevin gund, wê zarokên me û gundî birevin pêşiya me?

– Wê werin pêşiya me, Husik got.

– Em ê ji wan re çi bibêjin?

– Em ê bibêjin Çûkûrova binerd bûye...

– Ma em ê wilo bibêjin? Memed bi qerf got.

– Em ê wilo ji wan re bibêjin, Aşik Alî bi dengekî nerm û hê bi qerftir got.

– Ma em ê ji zar û zêçên xwe re çi bibêjin?

– Em ê bibêjin erd qelişî ye û Çûkûrova ketiye binê erdê.

– Ez ê bibêjim çi?

Husik hêrs bû:

– Tiştê tu bibêjî belî ye, got, berê xwe bi çiyan ve kir û meşiya.

– Here! Memed got. Here dojehê. Bila vê zivistanê zar û zêçên te jî ji rûyê te birçî bimînin...

Ew di nîvê rê de rawestiyabû, herdu milên xwe di ber xwe de berdabûn û bi dengekî bilind diqîriya.

– Tu ê Ûsiv bikujî, wî digot. Tu ê bibî qatilê wî. Dibe ku li vî gundî meleyekî ku nivişteke ji Ûsiv re çêbike, hebe. Dibe ku Ûsiv bi nivişte xelas bibe. Dibe ku li vî gundî yekî ku derziyekê li Ûsiv bixe hebe, yekî ku hebekê bidiyê hebe, ger em herin vî gundî dibe ku Ûsiv nemire... Dibe ku bîreke vî gundî ya ava cemidî, kehniyeke vî gundî î hênik hebe. Dibe ku Ûsiv xwe di ava sar dake û bi ser hişê xwe ve were.

Her ku wî digot Husik hê bêtir hêrs dibû. Her ku ew hêrs dibû jî, wî bêtir xwêdan dida.

Ew hebekî bi dûr ketin, lê Memed wilo di nîvê rê de ma. Wî di ber xwe de bi pistînî tiştin digot. Siya ewrekî di ser wî re biburî. Piştî siya ewr, rojê xwe weke topekê bera ser deştê da. Deng ji Ûsivê ku li pişta Husik bû dernediket, ew mîna ku razayî be, mîna ku miribe, lingên wî bi erdê ve dikişiyan û di riya bi toz de xêzên dirêj çêdikirin.

Roja dilşewat li firêzan dixist, şewqa wê ya pir, çavên mirov dişewitand. Ji ber şewqa rojê wan nikarîbûn çavên xwe vekirana û li wî alî binihêrîna. Hemû di xwêdanê de mabûn û ji tîna dişewitîn. Di nav zeviyên der û dora wan de leglegên çîpdirêj bi çîpên xwe yên zirav xwe li ba dikirin, stûyên xwe yên dirêj hebekî din jî dirêj dikirin û dimeşiyan. Ji bember traktorekê batozek avêtibû dû xwe û hêdî hêdî dihat. Li dû batozê jî sî-çil karker, bêdeng, stûxwar û xwas dimeşiyan. Ew westiyayî û ji haldeketî dixuyan. Ew vekişiyan kêleka rê û heta ku batoz û karker derbas bûn ew li kêleka rê rawestiyan.

Berî ku ew têkevin rê Memed:

– Bi dar e, hênik e, got. Li van deran, li van nêzîkan qet av tuneye. Ger wilo here em ê li vê çolê ji tîna bimirin. Wê qertelên boz goştê me, wê piça goştê me yê ku maye bixwe û wê hestiyên me yên spîboz jî biavêjin nava vê şewatê.

– Wê biavêjin, Husik bi dengekî nerm got.

Memedê ku ji vê yekê hêz stand:

– Ew gund li wir e, binêrin bê çiqasî şênkayî ye... Ma dibe ku li wir qet kar tunebe? Binêrin, ev batoza ha jî diçe wir. Dibe ku nivîştek... Wê Ûsiv bimire... Wê meytê wî jî bêhn bide... Gava ew pale di ber me re buhurîn, we nedît ku wan çawan çavên xwe vekiribûn û li me dinihêrîn, wilo ecêb, mîna ku ew li heywanan binihêrin, wan li me dinihêrîn...

Aşik Alî:

– Gelo çima wan wilo li me nihêrîn?

– Wê binêrin, Husik got.

Ji mêj ve Memedê zarok dixwest tiştekî bibêje, lê dikir û nedikir nikarîbû bigota. Bi carekê ve pijiqî:

– Ez ji tîna mirim, got. Ew gundê ha jî bi dar e, çima em naçin wî gundî, dibe ku li wî gundî kar hebe.

– Ma dibe ku kar tunebe, Aşik Alî got. Gundekî ewqasî hêşnayî lê hebe û kar lê tunebe, ma tiştê wilo dibe? Ez ji tîna mirim.

Memed li pêşiya wî dimeşiya, ew rawestiya, li pişt xwe zîvirî û bêbawerî lê nihêrî.

– Ez ji tîna mirim, Aşik Alî got. Te çi wilo çavên xwe beloq kirine û tu li min dinihêrî?

Husik jî rawestiyabû:

– Ez westiyam, got û ber bi komek kulîlkên hîro ve meşiya. Ew hîro di bejna mirovan de bûn, gulên wê yên pembe bi qasî destekî vebûbûn û ji serî heta binî di toza rê de mabûn. Di nav kulîlkên hîro de Ûsiv ji pişta wî herikî xwarê. Yên din jî xwe gihandin ba wan û rûniştin. Di ser wan re hin perçeewr derbas dibûn, tam wan digotin ku ew hênik bûn, hew didîtin ku dîsan roj bi hemû giraniya xwe derket û ew ji german peritandin. Ji tu deverê, sira bê tunebû. Her ku diçû, erd jî dibû mîna sêleke sincirî. Ji niha pê ve wê meş gelekî zehmet bibûya.

Pinpinîkeke şîn xwe li ser hîroyê danîbû û xwe tev nedilivand.

Memed di ser stûyê xwe re zîvirî û di ber xwe de got, kuro, di vê germa Xwedê de, li vî cihê ku dilopek av jî lê peyda nabe, çi karê vê pinpinîkê heye...

– Binêre, wî got û niqurçek li Aşik Alî xist, tu ji xwe re li vê pinpinîkê binihêre! Di hundurê vê tenûrê de, li vî cihê ku dişewite de...

– Wey lawo, Aşik Alî bi ecêbmayî got, ev ne karê aqilan e, hem jî ev pinpinîk pir mezin e, bi qasî çûkekê ye... Kî zane bê kîjan bayî ew avêtiye vir.

Husik:

– Pir ecêb e, di vê germa havînê de, ev pinpinîka evqas mezin. Ew qet tevnalive. Belkî jî ew miriye.

– Ew ne miriye, Ûsiv bi dengekî bilind got. Bala xwe bidin baskên wê, bê çawan dişewite. Ma ji ku ew miriye?

Peyivandina Ûsiv ya bi dengekî bilind û zindîbûna wî, ji ecêbmayînê bêtir ew kêfxweş kirin.

– Li vir, li vê jêra ha, di bin zinarên Anavarzayê de pirikek heye, ji van pinpinîkan havîn û zivistanan bi keriyan in.

– Min jî ew dîtin, Memedê zarok got, ew di ser me re weke ewran diherikîn. Ew şîrkî bûn, mor bûn, dibiriqîn.

Aşik Alî:

– Ewrekî şîrkî yê stêrkan diherikî û ber bi zinarên Anavarzayê ve diçû. Hingî ew zinar ji pinpinîkan mor dibûn û stêrk vedimirîn... Pinpinîkên şîrkî, kesk û zipîzer...

– Ev pinpinîka ha miriye, Husik got.

Yên din deng nekirin. Wan ziq li pinpinîka ji gula hîro mezintir ya ku xwe li ser gula hîro danîbû dinihêrîn. Lê pinpinîk tevnediliviya.

Di ser wan re çend perçeewrên din jî derbas bûn, lê wan hê jî ziq li pinpinîkê dinihêrîn.

Memedê zarok xwe negirt, ya dilê wan got.

– Înşalah ew nemiriye, got.

Memed bêhneke kûr girt û berda.:

– Înşaleh, got.

Aşik Alî:

– Înşaleh...

Husik û Ûsiv jî gotin înşaleh. Kesî bîr nedibir ku rabin û binerin bê pinpinîk miriye an jî sax e. Ne ku wan bîr nedibirin, wan newêrîbûn.

Piştî kêliyekê, gava siya wî ewrê mezin li ser wan rawestiyabû, otomobîlekê toza ser rê ji ber tekerên xwe pijiqand û buhurî. Şaxên hîro yên ku di tozê de mabûn, hejiyan. Ew pinpinîka şîn jî hejiya lê ji cihê xwe tevneliviya.

Memedê zarok:

– Ez ê wê şiyar bikim, got û rabû ser xwe. Ew radizê.

Hêdîka bi tirs ber bi pinpinîkê ve meşiya. Gava ew nêzîkî pinpinîkê bû û destê xwe dirêjî wê kir, qêrînekê ew di cihê wî de sar kir, destê wî jî wisa li hewa ma. Bi qêrîna Ûsiv re pinpinîk bi qasî bihustekê firiya û dîsan mîna ku tiştek nebûbe xwe li cihê xwe yê berê danî.

Bi firîna pinpinîkê ve hemû ji kêfan ji cihê xwe hol bûn.

Ûsiv:

– Firiya, bi ken got.

Yên din jî:

– Firiya, gotin.

Memed:

– Ew gund bi dar e.

Husik:

– Ew gundekî gelekî xweş e, bi dar û ber e. Li wî gundî kar jî heye.

Hemûyan bi dengekî kar heye, gotin û bi lez berê xwe bi gund vekirin û meşiyan.

Memedê zarok di pêşiya wan de weke cewrikekî dimeşiya.

Li pişt xwe zîvirî û got:

– Ger em kar bibînin, mafê min...

– Hey hustu şikest, Husik bi hêrs got. Hey hustu şikest...

– Hêrs mebe, Memed bi ken got. Binêre va ye Ûsiv jî bi ser xwe ve hat.

– Ecêb e, Husik got. Çi bi vî zilamî hatiye?

– Hela hinekî rawestin, Aşik Alî got. Înşalah Ûsiv baş bûbe.

– Înşaleh, Memed jî got.

Li başûr, ewrên li ser derya spî mezin dibûn û bilind dibûn. Hêdîka bayek jî dihat û bêhna xwêya deryayê dixist pozê wan. Ew heta bi bazinên lingên xwe di tozê de mabûn, çaroxên wan tije toz bûbûn, te digot qey ew di nav xweliyê de dimeşiyan.

Gava ew li dor esir gihîştin gund, ew birçî bûbûn, westiyabûn û ji hal de ketibûn. Şaxên hersê darên tuyê yên di orta gund de, cihekî mezin girtibûn. Li bin dara ortê avkêşeke sor û mezin, li dor avkêşê jî hewdikên ji kevir hebûn. Binê daran seranser hatibû avreşandin, û li binê daran kursî û mînder hatibûn danîn. Li dora hewdikan gul hatibûn çandin, guleke pembe î bi şax vebûbû û bêhna wê li bin darên tûyê belav dibû.

Heta ku ew gihîştin binê daran bêhna wan çikiya. Memed tavilê xwe gihand ba avkêşê, xwe avêt milê avkêşê yê sor û av kişand. Gava av ji avkêşê hat:

– Were Ûsiv, got.

Ûsiv çû ba wî.

– Serê xwe têxe binê avkêşê...

– Nabe, Memed got. Nebaş e ku bê ku ew bêhna xwe berde ew wilo avê vexwe. Serê xwe têxe bin avkêşê.

Ûsiv stûyê xwe dirêj kir û serê xwe xist bin avkêşê, di ser serê wî re ava ku Memed dikişand mîna ava kehniyan dikir bulqînî. Bi carekê ve dilê Ûsiv şa bû, nexweşiya xwe ji bîr kir û li ber xwe da.

Piştî wî Husik, dû re Aşik Alî û Memedê zarok serên xwe dane ber avê. Paşê jî Aşik Alî av kişand û Memed serê xwe da ber avê. Dawiyê jî kulmên xwe dane ber avê û heta ku zikên wan ji avê nepixî wan av vexwarin.

Gava ew li ser dikika bîrê rûniştin û der û dor di ber çav re derbas kirin, ew li çar kalemêrên ku li bin daran bûn, hayê bûn. Ew kalemêrên ha di nav re mêşên ku xwe li ser rûyên wan datanîn diqewirandin û xilmaş dibûn. Li hemberî wan jî pênc-şeş zarok di nava toz û heriyê de mabûn, bi qîj û wîj bi celebekî lîstika bîlyayê dileyistin. Deriyê hemû xaniyên kelpîç yên hember girtî bûn. Mirîşk digel çêlikên xwe li ber siyên traktorên rengîn yên di hewşan de ji xwe re li cihekî digeriyan. Elokeke mezin ya ku bi berkurkeke nepixandî digeriya, ji ber çavên Ûsiv nereviyabû.

Heta ku bayê esir rabû û ewrên spî yên li ser derya spî bilind bû, ew bi rêz rûniştibûn û qet deng ji wan dernediket. Traktor, kamyon, zadçin û erebeyên hespan di nava gund de derbas dibûn. Ji bilî van, însan û heywanên ku di nava gund de digeriyan, tunebûn. Te digot qey hertişt di xew de bû. Piştî hênkayiya êvarê, çend jin bi satilên xwe derketin û hatin ser bîrê û bê ku bipeyivin satilên xwe tije av kirin û vegeriyan malên xwe. Du heb ji kalemêrên ku dirêjkiribûn, her yek ji cihê xwe kuxuyan. Di hewşekê de gulên berbiro vebûbûn û berê xwe bi rojê vekiribûn. Roj ber bi ku de biçûya, wan jî rûyên xwe bi wê hêlê de ba didan. Her gulek berbiroyê, fena siniyekê mezin bû.

Tam di vê navê de Ûsiv:

– Ez mirim, bi nalîn got. Ez mirim, min sar e.

Wî xwe ji ser dikikê avêt erdê û xwe di nava toz û heriyê de vegevizand.

– Ez mirim, min sar e, ez qefilîm, goştê min ji hestiyên min tê gurandin.

Husik rabû çû ber serê wî, destên xwe li wî gerandin û heta ku jê hat şidand:

– Weha meke Ûsiv, wî got. Tu îro hebekî baş bûyî, te dît bê çiqasî kêfa me hat. Vê bi me meke, vê meyne serê me... Ax û waweylê li me.

Mîna ku li hêviyekê digeriya, çavên xwe beloq kiribûn û li der û dora xwe dinihêrî.

– Were serê xwe bide ber avkêşê, dibe ku bi kêr were. De were Ûsiv.

– Min sar e, ez dimirim... Ez dimirim Husik.

Husik hêrs bû:

– Bimire, biceheme, here cehenemê, tewteweyê heram. Ger tu weha bûyî, çima tu bi me re hatî Çûkûrovayê û bûyî bela serê me! Bimire, bimire, bimire, kuro, biceheme. Hem jî here nîvê cehenemê. Tu li cehenemê nacemidî.

– Min sar e, ez dimirim... Ez dişewitim...

Husik bi hêrs çû û bi avkêşê av kişand.

Ava ku ji avkêşê dihat, diherikî delêv. Wî demekê weha mîna dêhnan bê rawestan û bêseheb av kişand. Bêhna wî diçikiya. Paşê hat, mîna ku jê xeyidî be, pişta xwe dayê û li ba Memed rûnişt.

Kalemêrên li ber siyê rabûn û li ser serê Ûsiv kom bûn, wan bi şaşmayî li Ûsivê ku li erdê vedigevizî dinihêrîn.

– Ev ta ye, yekî ji wan got. Tam heft salan ez jî wisa hem ji

serman diricifîm, hem jî ji german diperitîm. Paşê Göde Mustafa hat û ez rehet kirim. Göde Mustafa Efendî li hemberî tayê hem kinin belav dikir hem jî efsûn çêdikir. Hem kinina wî li tayê dihat, hem jî efsûna wî. Gava ku didîtin li deverekê ne kinin pere dike ne jî efsûn, ew dişandin wir...

Mêrik her dipeyivî. Baş nedihat fêhmkirin bê wê derê kê derê bû, wî her digot, ger ev zilam negihîje wir wê bimire.

– Wê zilam bimire.

Husik guhê xwe didan wî, bê ku ji gotineke wî bimîne, lê guhdarî dikir.

Hê wilo, li ser serê Ûsivê nexweş tije jin û mêr, zar û zêç bûn.

– Wax, gotin, wax ev çiyayî jî hîç li ber tayê debar nakin. Em li vê Çûkûrovayê ji heft salî heta heftê saliyan bi tayê ketin û jê xelas bûn, qet ne xema me bû jî... Hema ku ev çiyayî carekê bi tayê dikevin ew dimirin, ha weke vî.

– Canê van çiyayiyan pir nazik e... Nedîtine camêran, wê rebenan çi bikin.

– Kar jî nîne, jineke ciwan ku ji girêdana serê wê diyar dibû ku ew bûkeke nû ye, got.

– Ev du-sê sal in ku ev rebenên çiyayî weha dikişin vê Çûkûrovayê. Hem ew bi tayê dikevin û weha dimirin û hem jî ew kar nabînin û birçî dimînin. Jinek bi tasek û bi sê kinina hate ba wan.

– Van hersiyan jî daqurtîne, an na wê li te nebe sibe tu ê bimirî. Taya jehrî tu girtiye, piştî vê tu îflah nabî.

Pîrejinekê got:

– Kurê min, bila hevalên te te bibin wir.

Husik nêzîkî jinikê bû:

– Ku?

Jinikê Husik ji neynûkên lingan heta porê serî di çav re derbas kir:

– Ma tu hevalê vî yî?

– Ji roja ku em hatine Çûkûrovayê ew ji pişta min neketiye. Ew li ber mirinê ye.

Jinikê bi milê wî girt û ew xewle kir, di guhê wî de got:

– Wî bibin wir. Berê gava em bi tayê diketin em diçûn wir.

– Hûn diçûn ku?

– Raweste, melezîne. Wir... Li binê wir kanîkek dikele. Raweste, melezîne.

Keçikeke biçûk nêzîkî wan bû:

– Dara hinarê a li ser girik, got.

Jinik bi keçikê re hêrs bû:

– Çavrijiyayê, got. Ma mirov dikare li her derê weha bi dengê bilind qala wê dara hinarê bike, bey hustu şikest! Binê dara hinarê cihê cihê şêx û mişayixan e. Hûn werin ba min, hema dinya li me rohnî bibe, stêrka sibê derkeve, ez ê wî cihî ji we re bibêjim. Hema ku hûn bigihîjin wir, wê Xwedê we bide xatirê Şêx û Ewliyan û hem ji tayê xelas bike, hem jî wê...

Wê mala xwe nîşanî Husik da, di guhê wî de jê re got bê divê ew kengî werin û tavilê ji wir çû. Piştî kêliyekê ew bi buxçukek nan, bi qûşxaneyek savara bi rûn û bi şerbikek dew vegeriya ba wan.

– Çûkûrova tije gawir bûye. Li Çûkûrovayê însanetî nemaye. Berê jî tunebû ya, lê niha hîç nema ye. Ez jî ji wan çiyan im, birano.

Li pişt xwe zîvirî, destê xwe ber bi çiyayê Duldulê ve kir.

– Ha ez bi qurbana wî çiyayî bim, ez ji hesreta wî çiyayî re

mirim, ez ji wî çiyayê tûj im. Ez ji wê buhuştê me. Ka rûnin û xwarina xwe bixwin zarokno, kî zane bê ev çend roj in hûn birçî ne. Ax, ger çenikek bûz heba û min têxista nav dewê we... Ji xwe li vî feqîrê nexweş binerin...

Keçikeke ciwan ku delingekî xweşik lê bû û xavikeke bi morîk li serî bû:

– Bûz li ba me heye, got û ber bi malê ve baz da. Ez ê tavilê herim bînim.

Keçik hema ji ber çavan winda bû û piştî kêliyekê bi seriyek bûz vegeriya.

Wan sifre li ser dikikê raxistin, qûşxane danîn orta sifrê, nan û kevçî bi rêzê danîn, tas tije dew kirin û her yeî çend dendî bûza ku şikandibûn, xistinê.

Gundiyan:

– Noşîcan be, gotin, bê deng bûn û vekişiyan.

Hevalên Ûsiv ew ji nav tozê rakirin, ew dawşandin, dest û ser çavên wî şuştin, paşê ew li ser sifrê dane rûniştandin û kevçî xistin destê wî. Ûsiv berî ku dest bi xwarinê bike, xwe daqûlî tasek dewê ku hê bûza wê neheliyabû, kir û heta qurta dawî ew tas bi ser xwe da kir.

Wan di bin awirên gundiyan de xwarina xwe xwarin.

– Pir şikir, gotin û ava bîrê di devê xwe werdan.

Qelebalixa gundiyan ya li bin dara tûyê her ku diçû zêdetir dibû, bayê xerbî toza nava gund vir de û wê de li ba dikir. Serê banan, dîwarên wan, pencere û deriyên wan ji tozê spîboz bûbûn. Pelên darên tûyan, gihayên hişk, erd û zevî, qirşik, kaktus, hertişt di binê tozeke qalind de mabû.

Qelebalix bêdeng bûbû û bi ecêbekê li mirovên dora bîrê dinihêrîn.

Memed ji nişkê ve rabû ser xwe, çavên xwe li ser qelebalixê

gerand, paşê serê xwe bera ber xwe da:

– Em ji bo kar hatine vî gundî. Ma gelo wê li vî gundî kar bebe? Ev gund pir bi dar û ber e... Ava bîra we jî cemidî ye...

Wî dîsan serê xwe bilind kir û çavên xwe li ser qelebalixê gerandin. Deng ji kesî dernediket. Memed çavên xwe bi bêviyekê li ser wan digerand. Kesî ferq nekir bê vê yekê çiqasî dom kir. Gundî hêdî bêdî belav bûn, gava kes li wir nema, Memed mîna ku biherike erdê, li kêleka bîrê rûnişt.

– Çiqas darên pir, çiqas mirovên pir, çiqas zeviyên pir...

Gava ro çû ava, wan xwe qulipandin vî alî û wî alî. Kelmêşan mîna ewran bi ser wan de girtin, mîna guran xwe davêtin ser wan.

Husik:

– Li vir nabe, em nikarin li binê vê darê razên, got. Divê em ji xwe re cihekî razanê, cihekî ku em bikaribin lê êgir dadin bibînin.

Memed:

– Aşik, ji me re straneke bibêje... Heta sibehê li tembûrê xe, stranan bibêje.

Gundî li ser dik û bana stareyên xwe li dar xistibûn. Bayê xerbî jî daketibû û stare hêdî hêdî di bin tava heyvê de dihejiyan.

– Ma niha wextê stranê ye? Aşik Alî mîna ku bi nalîn got.

– Erê, wexta wê ye, Memed got. Belkî...

– Belkî melkiya wê tune. Li vir, li vî gundî kar tuneye. Heydê em rabin.

– Ew jinika ji çiyayên me, ya ku xwarin da me... Qûşxane û sifra wê jî li vir in, ma bila ew li vir bimînin?

– Ma em ê çawan li vir razên? Aşik Alî got.

Memed:
– Belkî...
Husik:
– Belkî...
Ûsiv:
– Em ê sibehê, gava dinya rohnî bibe, dîsan werin gund, belkî...

Ew rabûn ser xwe, wan sifre, qûşxane û kevçî dane hev û derketin derveyî gund, çûn ser girikekî ku ji şewqa heyvê rohnî dikir, gîha dan hev, û tavilê hestê xwe pê xistin û dan bin gîhayê. Bi pêketina êgir re dengê kelmêşan kêm bû.

– Ez li serê we bûme bela birano. Ez bûme bela serê we. Xwezî ez sibehê nexweş neketima. Wer ku kekê Husik min li pişta xwe dike, pişta wî kete ber wî.

– Wê sibe Husik têkeve riya çiyan, Husik got. Sibe hê berî ro derkeve. Ne xêr li van gundên bêdar heye, ne jî yên bi dar... Hûn li vir bimînin, binerin, wa ye gundekî bi minare xuya dike, dibe ku li wir kar hebe.

Memedê zarok:
– Wê li wir kar hebe, got. Li gundên bi minare hertim kar heye. Nexwe ji bo çi ew ê li gund minarê çêbikin?
Memed:
– Lawik rast dibêje, bi ken got. An na wê ji bo çi minareke wilo spî û dirêj çêbikin.

– Pir dirêj e, Memedê zarok got. Ew bi şev jî dirêj dibiriqe. Wextî bigihîje ezmanan.

– Ger ew vê Çûkûrovayê gişî li ser navê min tapo bikin jî ez hew li vir dimînim... Ez ê sibehê bi rohilat re...
Ûsiv:
– Ez ê jî sibehê zû bi Husik re... Ax, ger ez nexweş neke-

vim...

Gava agir kêm dibû, dixan dadiket, kelmêşan jî fena cenawiran êrîşî wan dikirin.

– Bi vî awayî em ê hemû mîna Ûsiv hibin, divê sibe êvarê em têkevin riya çiyê, Aşik Alî got.

– Aşik Alî...

– Kerem bike, kekê Memed.

– Aşik Alî... Ma tu çareyên din hene?

– Na, Aşik Alî bi ken got.

Paşê jî wî tembûra xwe xist hemêza xwe, xwe bi ser de tewand û dest pê kir û lê xist. Li ser gulan, kehniyan, zinaran got. Li ser hesretê, li ser zilmê got. Wî digot, her kelmêşek wek gurekî ye, didire, perçe dike. Wî digot, Xwedayê ku Ûsiv ji bîrê derxistiye, li rûyê me nenihêrî, wê li rûyê me nenihêre. Wê hestiyên me yên spî li Çûkûrovayê bimîne. Wê kes li ser me negirî jî, wê meytên me mîna yên kûçikan bavêjin kortalekê, digot. Gula me çilmisî, kî dizane wê meytên me li ku bimînin, digot. Li wir, ji roja pîroz û bi vir de, ew dara hinarê li ser wî girikî li ba dibe, digot. Ew dermên dide biderdan û kar dide bêkaran, digot. Ji bin dara hinarê ya gulsor aveke mîna lampê diherike, digot.

Heta bi berbanga sibê, Aşik Alî stran û çîrokên nedîtî avêt ser dara hinarê.

Memed jê pirsî:

– Aşik, ma te ev dara hinarê dîtiye?

– Na, min nedîtiye.

– Ma te qet bihîstiye?

– Na, min nebihîstiye. Ew gundî hemû dizanin. Ma wê jinika ku xwarin ji me re anî, negot?

– Te, te ev strana ha ji ku derxist?

– Min dernexistiye, heq derxistiye.

– Ger em wê dara hinarê bibînin wê Ûsiv jî baş bibe, em ê jî kar bibînin.

– Ez li wê dara hinarê nagerim, Husik bi hêrs got. Ez ê piştî kêliyek din têkevim rê.

– Ka raweste Husik, Aşik Alî got û dîsan tembûra xwe hemêz kir û stranak din avêt ser dara hinarê.

Ûsiv:

– Li Çûkûrovayê herkes wê dara hinarê nas dikin. Wa meke Ûsiv, ev heft sal in ku vê mîrata nexweşiyê di zikê xwe de hildigirim. Ger em dara hinarê bibînin belkî Xwedê şifayekê bide min.

– Pir kerametên daran hene, Memed bi bawerî û ji dil got.

Memedê zarok:

– Kalikê min digot dar... Darên wilo hene ku weke ewliyan in... Belkî heqê min jî bidin.

Ûsiv:

– Pir kerametên daran hene. Dibêjin ku kelmêş qet nêzîkê wê darê nabin. Em ê şevekê li wir, li bin wê darê razên.

– Hûn herin, Husik bi hêrs got. Kuro, ma qet dibe ku li Çûkûrovayê kelmêş tunebin. Ma wê ew dara reben çi bike ji kelmêşan? Her yek ji wan wek gurekî ye.

– Tobe bike, Husik, tobe bike, Memed bi tirs got. Nebe, nebe, tu tiştekî ji wê darê re nebêje, tu ê hişk bibî. Ji xwe ocaxa me kor bûye, em rezîl bûne, tu xwe gunehkar meke, tu ê jî hişk bibî... Ji xwe Ûsiv têra me dike. Binêre Husik, li xwe miqate be, wa meke!

Aşik Alî:

– Binêre ha, got. Tu tu bî, tu zimandirêjiya ewliyan mekî, ji xwe zimandirêjiya daran...

Rabû ser xwe:

– Divê rêwî di riya xwe de here, û kete rê. Hela ka bimeşin em careke din jî herin vî gundî, belkî Xwedê...

Yên din jî bêdeng dane dû wî. Gava ew dimeşiyan bayê hênik dilê wan şa dikir, di hundurê wan de dilşahî û hêvî hêşin dikir. Husik jî li dû wan dimeşiya.

Ew hatin ser bîrê û li binê daran rûniştin. Bi carekê ve dengek ji gund hat. Gundî hemû bi hev re, bi hespên xwe, bi dewarên xwe, bi kerên xwe, bi traktorên xwe, bi erebeyên xwe yên hespan, bi zadçinên xwe, bi paleyên xwe şiyar bûbû. Deng tevlihev bûbûn, dîkan bang didan, kûçik direyan. Ji cihekî ve jî dengekî melûl û bi hizin yê banga melê dihat bihîstin.

Ew demekê li bin dara tûyê, li ser bîrê rawestiyan.

– Ew jinika ji Çiyayê Duldulê, ew jinika qenc dizane, got.

– Ew dizane, Aşik Alî jî got.

– Ma çawa ew nizane! Memedê zarok jî got.

– Li vê Çukuovayê herkes wî cihî dizanin, Ûsiv got.

Traktor û kamyon tije gundî bûbûn û bi zadçinan re derdiketin derveyî gund. Piştî kurtedemekê dîsan gund di bêdengiyeke kûr de ma. Ew herçar kal jî dîsan hatin bin daran, gopalên xwe xistin bin çengên xwe û rûniştin. Çend jin hatin ji bîrê av kişandin û çûn.

– Mala wê jinikê li ku ye?

– Ew ê niha were, Memed got.

– Ew li malê li benda me ye, Ûsiv bêsebir got. Helbet ew bi tiştekî dizane loma wê xwest em herin mala wê.

– Ji xwe bi tiştekî dizane, Ûsiv bi dengekî bilind got.

– Heydê em herin li mala wê bigerim.

Wan rahiştin sifre û qûşxaneya wê û li nava gund li mala jinikê geriyan.

– Ka em mala jinikê ji hinekan bipirsin, Husuk got.

– Mala kê, mala kê?

– Mala jinika ji Çiyayê Duldulê...

– Mala wê jinika qenc, Memedê zarok got.

– Tu kes li derve tuneye, tu kes!

Dixan ji banên malan bilind dibû, li baxçe û li nava zeviyan keldûmaneke tenik difûriya. Tu nemabû ku serên çiyayên Gawirdaxê yên hember spî bibûna. Nava gund bêdeng bûbû, kes li der û doran nexuyabûn.

– Me çima mala wê jinikê ji wan kalan nepirsî?

– Ew nizanin, Husuk got. Ew ê ji ku bizanibin, her yek ji wan hezar salî ye.

Gava çavên wan ji nişkê ve li jinikê ketin, ew di cihê xwe de sar man.

Jinikê...

– Werin zarokno, got, ez ê ji we re çayê jî bidim ser êgir; ez ê penîr jî, rûnê nîvişk jî, nanê sêlê jî bidim we. Kerem bikin, werin.

Wan dane dû jinikê, ew ketin hewşa xaniyekî kelpîçî. Li hewşê, li ser gîhayê sifreyek hatibû raxistin, keçikeke ku emrê wê li dor çardehan bû, li ser lingan li bendî wan rawestiyabû. Ew li dora sifrê bi xelekî rûniştin, jinikê qedehên bejinzirav tije çayê kir, ew bêî ku bipeyivin dest bi xwarinê kirin. Bi tenê dengê cûtina wan dihat bihîstin. Wan bi lez taştiya xwe xwarin.

Piştî ku Memed devê xwe bi pişta destê xwe paqij kir:

– Me tu kar nedît, got. Tu derê Çûkûrovayê nema ku

em lê negeriyan, lê me tu kar nedît xwişkê, ma ev çi bi vê Çûkûrovayê hatiye?

– Ez nizanim, jinikê got. Ev çend sal in ku li Çûkûrovayê wisa bûye.

– Çûkûrova tam guhertin, Memed got. Ew xwişka min heye ya, wê qet li rûyê min jî nenihêrî. Gayê min yê zer hebû ya, ew jî ji traktorê re kirine qurban, xwîna wî ya sor rijandine bin tekerên traktorê. Ew gayê min yê zer hebû ya, min tam sê salan bi wî cot kiriye. Gava ez çûbûm, rebeno li dû min giriyabû.

– Ga digirîn, jinikê got.

Husuk bêsebir bû, bi carekê ve xwe avêt ortê:

– Ew li ku ye, xwişkê? got.

Jinik:

– Çi li ku ye?

– Cihê wê dara hinarê nîşanî me bide, Husuk got. Belkî ew ji derdê me re çareyekê bibîne. Dibêjin ku pir kerametên daran hene.

– Rast e, kerametên daran hene, jinikê got. Ger ew dar hê li cihê xwe be.

– Tu tişt bi dareke wisa nayê, Memed got. Tu carî tiştek bi dareke wisa nayê. Tu kes nikare tiştekî bi dareke wisa bike. Çûk jî ji ber keramet û hurmeta wê xwe li ser şaxên wê danaynin, mêş li dora wê nafirin, mêşên hunguv xwe li ser kulîlkên wê danaynin. Yê ku bixwaze tiştekî bi darê bike, wê bawî bibe, wê mala wan wêran bibe.

Jinik:

– Dibêjin ku ew dar xeyidî ye. Ji van însanên zilmdar xeyidiye. Dibêjin ew xeyidiye û êvareke lêxistiye, firiyaye û çûye.

– Ew naxeyide, Memed got. Xwedê ew dar...

Wî nizanîbû bê wê çi bigota. Gotin di devê xwe de bir û anî û dawiyê bi hêdîka got:

– Ew dar naxeyide, ew ji cihê xwe tevnalive. Ji ber ku hewcedariya însanan bi wê heye. Ma ne ji wê be wê yên bi tayê çawan rehet bibin, wê nexweş çawan zindî bibin, wê karker çawan kar bibînin?

– Ew xeyidiye, jinikê bi stûxwarî got.

– Tu bi tenê cihê wê ji me re bibêje, Husuk got. Divê em wê darê bibînin, em halê xwe jê re bibêjin. Te divê bila wan ew dar ji kokê de rakiribin, em ê derdê xwe ji koka wê re bibêjin. Te divê bila wan ew ji kok de rakiribin û pel û şaxên wê biribin, em ê ji cihê wê re qala rewşa xwe bikin. Tenê ku em wî girikî bibînin û em şevekê li bin wê darê razên.

– Ger dara hinarê ya pîroz rabûbe û çûbe, ger ew dareke pîroz be, em ê herin dîwana wê, em ê dia bikin, derdê xwe jê re bibêjin, ew ê were hawara me û wê ji derdê me re dermanekî bibîne û ger ew xeyidî be jî ew ê dîsan bi paş de vegere...

– Wê were, Husuk got. Ger ew xeyidî be jî, ew ê dîsan were.

– Wê were, Memedê zarok bi kêf got.

– Wê were, ma dibe ku ew neyê? Ûsiv bi nalîn got.

– Wê were, wê were, Aşik Alî got. Hinarên pîroz, mirovên qenc hertim pîroz û qenc in.

– Qenc in, pîrejinê got.

– Cihê wê ji me re bibêje xwişkê,

– Ji bo xatirê Xwedê xwişkê, cihê wê ji me re bibêje.

– Ger tu cihê wê ji me re bibêjî tu ê rast herî cunetê.

Jinikê da pêşiya wan û ew derxistin derveyî gund. Wê berê xwe bi keleha Anavarzayê ve kir û jêrî wê nîşanî wan da. Dawiya deşta ku ji german leylan lê rabûbû, mîna mijekî sivik daketibû ser deştê, gir û şikêr û darên li wî aliyê deştê bi zorê xuya dikirin.

– Hûn ê ji vir di ser Ceyhanê re herin, bûn paşê derkevin ser riyeke qîr û zift, hûn ê ji wir jî dakevin jêr, paşê hûn ê bigihîjin gundekî, hûn ê di jorî gund re derbas bibin û bigihîjin newalekê. Hûn ê li dora Anavarzayê bizîvirin, hûn ê paşê bi jor ve hilkişin, gava we dara benîşt ya mezin dît, hûn ê li milê rastê bizîvirin, gava bûn zîvirîn wê erdeke rast derkeve pêşiya we, ew erda rast bi kevirên neqişandî hatiye xemilandin, bêî ku hûn pê li keviran bikin hûn ê derbasî hember bibin, gava berê we bi quble, bi hêla ku bayê xerbî jê tê û ewrên spî lê dicivin vebû, wê ew girikê ha derkeve hemberî we, gava we girik dît, divê hûn li wir rawestin, ji cihê xwe tevmelivin, gava dinya rohnî bibe divê hûn herin ser girik û li binê dara hinarê rûnin. Heydê em herin malê.

Wê zû da pêşiya wan ew birin malê. Jinik bi lez ket bundur û bi buxçukekê derket.

– Ha ji we re, di nava vê buxçukê de nan, penîr û pîvaz heye. Ev der Çûkûrova ye, di riyan de birçî nemînin.

Memed destê xwe dirêjî buxçukê kir û jê stand:

– Xwedê ji te razî be, xwişkê, got. Çi miradê te hebe Xwedê bike.

– Xwedê bike, Memedê zarok jî bi ken got. Ez ê jî li bin dara hinarê dia bikim, ku xwedîkar heqê min bidin min. Ez ê jî cotek ga bikirim, cotek gayên qulonçmezin.

– Ma ku qulonçên wan ne mezin bin, çênabe? Aşik Alî

pirsî.

– Çêdibe, Memedê zarok bi hêdîka got. Dibe, lê ger qulonçên wan mezin bin baştir e, ew ê bi heybettir bixuyin.

– Rast e, Husuk got, ew ê bi heybettir bin. Ger te got ga, divê qulonçên wan mezin bin.

Jinik rawestiyabû, li wan guhdarî dikir, lê tiştek ji wan fêhm nedikir, rûyê xwe diqermiçand û dikeniya.

– Xwişka me ya xweşik û mervan, te navê xwe kerem nekir, navê te bi xêr? Ji kerema xwe re navê xwe yê xweş ji me re bibêje.

– Navê min Cenet e, jinikê bi şermokî got û rûyê wê mîna yê keçeke ciwan sor bû.

– Xwedê rehetiyê bide te, xwişka me ya dilovan, Cenet Xan.

– Yên din jî:

– Xwedê rehetiyê bide te, xwikşa me ya xweşik û dilovan, gotin. Û ber bi Anavarzayê ve ketin rê.

Serê çiyê di nava ronahiyê de mabû, wê piştî kêliyeke din roj derketa. Serê çiyayê Duldulê ji niha ve dişewitî, çavên mirov li ber venedibûn.

Gund bi tibabekî li dû wan mabû. Ew bêrawestan dimeşiyan, gihîştin ber çemê Ceyhanê.

Memed:

– Piştî ku em ji avê derbas bibin...

Husuk:

– Eee bira, em ji avê derbas bibin... Ma tu ê dîsan tiştekî bînî serê me?

– Binêre, ev gundê li hember gundekî pir mezin e... Pir mezin dixuye. Belkî li wî gundî kar hebe. Hem jî ew li ser riya me ye...

Memedê zarok bi kêf:

– Li nava gund spîndareke bi qasî minareyekê heye.

– Ji minareyekê jî bilindtir e, Husuk got. Wey lawo, min qet dareke wilo bilind nedîteye.

– Min jî nedîtiye, Aşik Alî got.

– Me riya xwe pê xista, Memed got. Em bi niyet in, loma dibe ku dara pîroz xêrekê bi me bike.

– Wê qenciyekê bi me bike... Husuk got. Hemû bi hev re li Husuk zîvirîn û gotin gelo ew henekan dike. Em riya xwe pê xin, Husuk dîsan got. Belî nabe, Xwedayê ku Ûsiv ji bîrê derxistiye ...

– Wê me jî ji bîrê derxîne, Ûsiv di ber xwe de got.

Rûyê Ûsiv hêdî hêdî dihate guhertin. Tu nemabû nobeta wî bihata. Vê yeka hertim sibehan dest pê dikir. Ûsiv jî an ji german dişewitî an jî ji serman diqefilî.

Eerebeyên hespan, traktorên bi erebeyên naylonî û kamyon li peravê ketibûn dorê û li benda kelekê bûn. Wan kelek avêtibûn têleke qalind, têl jî di çirçirkeke hesinî re hatibû derbaskirin. Kelekvanan xwe diavêtin têlê û kelek dikişandin.

Her gava ku Memed li kelekan siwar dibû, bêhna spîndaran dikete pozê wî û vê bêhnê daristana spîndaran dianî bîra wî.

Gava ew ji kelekê daketin xwestin pera bidin kelekvên. Yê kelekvan:

– Ne lazim e, ez peran ji we nastînim, kelekvên got û tifek mezin avêt nava avê. Ez di dê û xweha Çûkûrovayê... bi hêrs got. Lêxin herin çiyayên xwe, an na hûn ê hemû li vir bimirin, êdî li van deran xêr nemaye.

– Nemaye, Husuk got. Spas bira.

Ew ber bi gundê bi spîndar ve meşiyan. Di rê de dîsan Ûsiv dest bi ricifandinê kir.

– Tu qîmeta wê nîn e, Ûsiv got. Hûn guh medinê. Çawan be em diçin ba dara hinarê... Binerin, va ye gundê bi spîndar jî xuya dike. Ger me karek bidîta û ez jî bixebitiyama hingî ez ê baş bibûma. Hertim weha dibe, gava ez kar dibînim ez rehet dibim.

Husuk çend caran xwest Ûsiv li pişta xwe bike, lê Ûsiv:

– Nabe, got, ez ê bimeşim, oooy, ez ê bimeşim.

Memedê zarok çû û ket bin milê wî. Ûsiv dixwest milê xwe ji wî xelas bike.

Mîna ku Husuk kerem bike:

– Bihêle Ûsiv, bila lawik têkeve milê te. Lêwik xwestiye, tu bi xwe nikarî bimeşî.

Ûsiv deng nekir:

Ew li dor esir gihîştin gundê bi spîndar. Bayekî xerbî yê xurt rabûbû û gund di bin ewrekî tozê de mabû. Di nava xaniyên gund de babîsok radibû, ka û gîha dikişand û ber bi Dumlukaleyê ve dibir. Ew demekê di bin tozeke qalind de man, dev û pozê wan tije toz bû. Wan nikarîbûn çavên xwe vekirana û li derî û dîwarên xaniyên gund binerîna. Ew bi delkan gihîştin ber spîndara nava gund. Li binê spîndarê dîsan avkêşeke rengsor hebû. Gava Ûsiv gihîşt wir, wî xwe avêt nava tozê, bi hawar û nalîn xwe di nava axê de vegevizand.

– Heqê xwe helal bikin, birano, ez dimirim. Ez dimirim birano...

Li devê bîrê gulên têvel hatibûn çandin. Hewdikê li ber avkêşê î ji kevir kevnare bû. Cihê deh peyan tê de hebû. Ew li jêrî hewdik rûnişt û demekê bêhna xwe berdan. Ba-

yê xerbî ku dinya di tozê de hiştibû her ku diçû dîntir dibû. Wan xwestin ku ew ser çavên xwe bişon, lê Aşik Alî:

– Nebe ha, got, em ser çavên xwe neşon, em ê di heriyê de bimînin.

Gava bû êvar û ro çû ava, bayê xerbî kêm bû, bi kêmbûna bê re jî ew yek bi yek rabûn ser xwe û ser çavên xwe şuştin. Ûsiv hê jî li erdê vedigevizî. Wan Ûsiv jî rakirin ser piyan û ser çavê wî şuştin. Ew li ser bîrê man û man lê ji gund kes nehat ba wan. Ji gund jî tu deng nedihat.

Memed:

– Çi bi vî gundî hatiye?

Husuk:

– Ew belkî li zozanan in...

Aşik Alî:

– Ew ê niha ji nava erdan werin. Hê ro nuh çûye ava.

Hê wilo traktorên bi erebeyên naylonî, kamyon, erebeyên hespan û yên bi peya gundî vegeriyan malên xwe. Bi careke ve bû ku te ax biavêta li erdê nediket. Piştî kurtedemekê jî otomobîlek li ber bîrê rawestiya, ji otomobîlê peyayekî dirêj î bi simbêlên dirêj, bi cîzme, bi şewqetareke mezin derket, qamçiyek di destê wî yê rastê de bû û ber bi wan ve çû. Hema ew tavilê rabûn û ketin rêzê.

– Ma hûn çiyayî ne?

– Belê, em çiyayî ne.

– Ma hûn pale ne?

– Belê.

– Hûn dikarin çi karî bikin?

– Çi kar be.

– Hûn rojê çiqasî dixwazin?

– Çiqas be xem nake.

Peyayê awirtûj hêrs bû, sê caran şîrqînî ji qamçiyê xwe anî:

– Tu bewcedariya min bi paleyên welê nîn e. Bi çiqasî be wê bixebitin! Rast e. Kuro li xwe binerin, hûn ê ji min re çi karî bikin, hûn ji birçîna bûne mîna segên har.

Aşik Alî:

– Xweşik bipeyive camêr, bi hêdîka got.

Girî ketibû qirikê, hêrs bûbû, şikiya bû.

Mêrik bi eynî sertiyê gavek ber bi wî ve avêt:

– Wey, gelo ma dilê begê min ma?

– Belê, dilê me ma, Aşik Alî got.

Mêrik gavek din jî ber bi wî de avêt û destê xwe da tembûra wî. Vingîniyek dirêj ji tembûrê hat.

– Ma tu hozan î?

– Xwedê qismet kiribe, em welê têne hesêb.

– Tu ê bi kêrî karê min werî, ger tu ji paleyên min re bikî tingînî ez ê pera bidim te, hê beg efendî.

Mêrik raste rast tinazê xwe pê dikir. Aşik Alî ji dil birîndar bû.

– Ez naxwazim, tu sax bî.

– Xuyaye dîsan dilê te ma.

– Belê, dilê min ma.

– Kuro çi dilê te dimîne, rojê panzdeh mitirbên mîna te li ber deriyê min in...

Memed bi serbilindî û bêxem gotin ji wan girt:

– Ev Aşik Alî ye. Kurê Aşik Husên e. Nav û dengê wan li van deşt û çiyan hemûyan belav bûye. Navê kalikê wî jî Aşik Xalid e, navê wan heta bi Avşarê çûye. Bavê wî jî Dadalogluyê mezin e. Aşik Alî ji sulala Dadaloglu ye. Ev tewra te ne qenc e.

– Kuro, mêrik got, çiyayiyê pîs, tu nemaye tu sulala wî bigihînî Osmaniyan, tu wî bikî merivê Mustefa Kemal.

– Ew ji sulala Dadaloglu ye, sulaleyeke pîroz e.

– Te got ew ji sulala kê ye?

– Ji ya Dadaloglu ye.

Mêrik bi pirqînî keniya.

– Dadaloglu. Kî ye ev Dadaloglu? Ma ew hozanekî mitirb e, kî ye?

Aşik Alî ji hêrsan dilerizî.

– Hiş e! Memed, bi qêrîn got, peyva bi vî mêrikî re heram e.

Mêrik jî qîriya:

– Hûn çi ne kuro, parsekno. Hûn kî...

Di vê navê de çend gundî jî hatibûn ba wan.

– Ka raweste, axa, yekî got û xwest wan navcî bike. Ka raweste axa, ma ev ji ku dizanin tu kî yî. Ma ger ew zanibin tu kî yî ew dikarin li ba te behsa sulalan bike?

Mêrik bi acizî berê xwe guhert.

– Ji wan re bêje bê ez kî me. Dadaloglu ye! Dadaloglu pîroz e, ji sulala pîrozan e! Kuro ger tu ji sulaleke pîroz î, wê çaxê tu çima ketiyî vî halî...

– Me çav bera malê kesî nedaye, Memed got. Em li kar digerin, em bi keda xwe dixebitin.

– Wê çaxê çi karê we li vir heye esilzadeyên min? mêrik dîsan bi qerf got.

Ew paşê zîvirî ser gundiyên li wir...

– Van çiyayiyan tavilê ji gund derxin! Ji niha û pê ve jî qet çiyayiyan nexin nava erd. Kuro bijî ev traktor, bijî zadçin! Kuro em hew dikarin ji ber van esilzadeyan bikin der! Kuro, wey esilzadeyin min wey! Ji sulala Dadal mada-

lan in... Kuro bijî Maraşal Marşal...

Ew li otomobîla xwe siwar bû:

– Van ji gund derxin, zû, tavilê. Ew ê îşev têkevin malê malên me jî, lê wê haya me ji wan çê nebe. Diz di ser van re tune... Min ê nîşanî we bida... Bişêkirînin ku karê min heye. Divê ez we li vir nebînim. Ez ê piştî nîv saeta din vegerim, ger ez we li vir bibînim êdî hûn texmîn bikin bê wê çi were serê we.

Otomobîl şixulî.

Gundiyan:

– Xwedê hûn ji destê axê xelas kirin, an na ew ê li vê meydanê bi qamçiyan bikişiya ser we, wê hûn perçe bikira. We axa pir hêrs kir. Ma mirov welê li hemberî axê dipeyive? Eman ha, eman, hema têkevin rê û herin... Ew ê piştî kêliyekê vegere, ew we li vir nebîne jî ew ê têkeve dû we û ger we bigire wê têra we li we bixe. Ew axayekî gelekî baş e, lê ev xuyê wî ne baş e. We şaşî kir, ger hûn li ber wî ranebûna wî ê kar bida we. Niha têkevin rê û herin, nebe nebe, hûn di rê de jî merin, çolbeyar herin, ger ew we bigire, bi Xwedê wê we bi qamçiyan bikuje.

Wê Memed bipeyiviya, lê Aşik Alî destê xwe da ber devê wî, bê ku ew tiştekî bibêjin ketin bin milên Ûsiv û ketin rê û çûn.

Husuk diranên xwe diqiriçandin.

Gava ew ji gund derketin, Aşik Alî:

– Em di rê de neçin, Xwedê bela xwe bidiyê, bela wî li ber deriyê wî be.

– Em ê di rê de herin, Husuk got. Ger ew mêr be ew ê were.

– Sîleha me nîne, Memed got. Xwezî demançeke me he-

bûya.

– Baş e ku nîne, Aşik Alî got.

– Xencera min bi min re ye, Husuk got.

– Înad meke Husuk, Aşik Alî got. Ji xwe tiştê hatiye serê me besî me ye...

Dengê wî ewqas êşdar û belengaz bû, ku Husuk tiştek negot, gava wan dan nava erdan, ew li ber Ûsiv rûnişt:

– Were Ûsiv, li pişta min siwar be, got, û wekî din jî hew tiştek got, gotin ji devê wî derneket.

Ji dûr ve dareke mezin xuya dikir, wan xwe li darê girtin.

Heyv derketibû û bilind bûbû. Zinarên Anavarzayê ji vir mîna rojê xuya dikirin, baskên xwe vekiribû û mîna çûkeke pîroz dixuya. Ji gundên dorhêlê ji dengên çend segan pê ve tu deng nedihat.

Wî axayê ha jî çavên makîneyên xwe dabûn rê û bi kamyon, zadçin û traktoran ketibû rê.

Gava ew gihîşt ber darê, ew ji hal de ketibûn, bema wan xwe avêtin bin darê. Ew qet nepeyivîn. Ji kesî dengek, pêjnek nedihat. Dengê nalîna Ûsiv jî nedihat, wî xwe mîna miriyekî li erdê dirêj kiribû. Ji roja ku ew daketibûn Çûkûrovayê, ev cara pêşî bû ku dilê Aşik Alî dibijiya cigareyekê. Ax, ger niha cigareyek hebûya û Aşik Alî dixana wê bikişanda kezeba xwe, bikişanda, bikişanda û bikişanda.

Wan ne agir dadan, ne xwarin hat bîra wan, ne jî guh dan ewrê kelmêşên êrîşker. Ew heta sibehê, bêî ku xew têkeve çavên wan li binê darê dirêjkirî man. Gava refek çûk di ser wan re derbas bû, wan hingî serê xwe rakirin û li esmanê ku hêdî hêdî rohnî dibû nihêrîn. Rojê dabû serê Gawirdaxê û serê çiyê dibiriqî.

Memed bi bejna xwe ya dirêj rabû ser xwe û bi piştа destê xwe çavên xwe paqij kirin, yên din jî çûn ser cihokê û dest û ser çavên xwe şuştin. Paşê li hev kom bûn û bi hev re berê xwe bi çiyayê Duldulê ve kirin. Rojê dabû serê çiyayê Duldulê, serê çiyê di şewqê de mabû, ew mîna stêrkekê dibiriqî.

Ûsiv vê sibehê jî baş bû. Ew ne ji sermayê diqefilî, ne jî ji germê diperitî. Wan nikarîbûn li rûyên hev binihêrîna. Herçî Mememedê zarok bû wî qet serê xwe hilnedida jor. Wî bi salan li ber deriyê zalimekî kar kiribû, wî zalimî hemû pereyê ku wî heq kiribû xwaribû, lê kesî mîna yê do erza wî neşikandibû. Her ku diçû derdê di bundurê wî de dilê wî diêşand û nizanîbû wê çi bikira. Gava wî zilamî erza wan dişikand, Memed dibû mistek, Husuk di rûnê xwe de diqijilî, Aşik Alî ji şerman dixwest têkeve binê erdê, dengê nalîna Ûsivê ku li erdê û di nava tozê de vedigevizî bûbû mîna qêrînekê û diêşiya. Ew batine vî temenî lê heta niha kesî bi vî awayî erza wan neşikandibû. Wan dixwestin herin serê zinarê Anavarzayê, li wir têr bigirîn û paşê xwe biavêjin devê zîhayekî merivxur. Ma ew hetanî sibehê li ser mêrikê xwediyê otomobîlê û li ser wî gundî çi nefikirîbûn...

Ew di nîvê wê deşta han de rawestiyabûn. Memed stûyê xwe yê dirêj bi vir de û wir de dizîvirand, mîna ku li tiştekî digere lê nabîne. Te digot aqil di serî de namabû. Yên din jî lê ecêbmayî mabûn û ziq lê dinihêrîn. Memed demekê rawestiya, mîna tiştê ku lê digeriya dîtibe, rûyê wî geş bû. Gava yên din çav li rûgeşiya wî ketin şewqek di rûyê wan de jî pê ket. Piştî ku Memed bi rûkenî li wan nihêrî, berê xwe bi zi-

narên Anavarzayê ve kir û meşiya. Yên din jî keniyan û dan dû wî. Memedê zarok demekê di cihê xwe de rawestiya, serê wî li erdê bû û difikirî. Paşê wî ji nişkê ve serê xwe ji erdê rakir, rabû ser xwe, reviya û gihîşt wan.

Gulên hîro yên şîn, şîrkî û sor mîna bejnekê bilind bûbûn. Wan di nav firêze û erdê birincê de xwe di ser cihok û kortalan de hol kirin û danê nîvro gihîştin binê Anavarzayê. Ji tîna germê, tozên li ser rê bûbûn mîna xweliya firnan. Wan nikarîbûn çavên xwe li ber Zinarên Anavarzayê ku ji ber şewqa çemê Ceyhanê dibiriqî, vekirana. Çem li vê derê bêdeng, mîna pêleke şewqê deşt dadigirt û diherikî. Ew ji dûr ve çav li keskahiyekê, çav li bîstanekî kesk ku tavilê hundurê mirov hênik dikir, ketin. Ew di xwêdanê de mabûn û helkehelka wan bû. Wan ji nişkê ve berê xwe ji bîstên guhertin û li Ûsiv nihêrîn. Ew îro hê nexweş neketibû. Wekî din her sibeh bi rohilat re wî xwe davêt erdê û digot: "Ez dişewitim, ez diqefilim". Ew bê ku tiştekî bibêjin wan rast berê xwe dan bîstên. Ew bê armanc diçûn nava bîstên. Hema wilo ji dilê wan hat, mîna yê çûkan. Di vê deşta sincirî de mirov, heywan, çûk, minminîk, bê hemdê xwe xwe davêtin nava vî bîstanî.

Wan nedixwestin ew herin ser çemê ku hemû şewqa deştê dicivand û dida çavên wan, ew jê direviyan, lê wan berê xwe didan vê meydana kesk. Heta mar û kêzik û kurmikan jî xwe didan rexê vê şînkahiyê. Bi hezaran hechecîkan baskên xwe li hev dixistin, mîna tîrê difiriyan, li ser bîstên digeriyan û carna jê didan dû ewrên mêşan.

Ew hatin ber bîstên û li kêleka hev rawestiyan. Bêhna leman, bêhna şebeş û petêxan li pozê wan xist. Wan ew bêhna ha kişandin hundurê xwe. Nava bîstên bêdeng bû,

di nav lemên mezin de şebeş û petêx li ser hev bûn. Lemên petêxan heta dêliya li rexê bîstên bû. Peyayekî ku li bin siya holikê razayî bû li ber çavên wan ket, lê ma wan ê çi bikirana ji mêrik.

Husuk:

– Gelo ma em herin bin siya wê holikê wê ne baş be?

Memed bêdil:

– Ma çi karê me li wir heye? Ev mirovên vê Çûkûrovayê ecêb bûne. Werin em li vir rûnin û zikê xwe dagirin, got bi milê wî girt û ew kişand. Heydê em li vir rûnin.

Ûsiv çerm û hestî mabû, bi rûyê xwe yê dirêj û zipîzer:

– Kî zane, got û bişirî. Diranên wî spîboz û dirêj bûn. Kî zane bê bin siya wê holikê çiqasî hênik e. Binerin, li binê holikê jî peyayek heye.

– Ma ger peyayekî biçûk li wir hebe, wê çi bibe? Ka binerin, wî tivinga xwe jî bi darê holikê ve bi dar ve kiriye. Ka çavên xwe baş vekin û lê binerin.

Ûsiv:

– Yanî biçûçik e, dibe ku jî zarokek be...

Aşik Alî bê ku bipeyive xwe di ser cihokê re hol kir û ber bi holikê ve meşiya. Yên din jî piştî dudiliyê dane dû wî.

Gava Aşik Alî gihîşt ber holikê:

– Selamueleykum, bi dengekî bilind got.

Peyayê ku li binê holikê razayîbû hol bû ser xwe û,

– Eleykumeselam, got.

Dilşahî ji rûyê wî difûriya. Wê yekê dilê Aşik Alî jî şa kir.

Em ji germê gêj bûne birawo, bi destûra te be em nanê xwe li binê vê holikê bixwin.

Yê li ber bîstên:

– Kerem bikin, kerem bikin, sî ya we ye, kerem bikin, got û cih da wan.

Mêrik ewqasî ji dil bû ku ew şaş û ecêbmayî man.

– Di vir re werin. Binê wê giha hêşin herî û çirav e. Xwe di ser vir re bavêjin.

Pêşî Aşik Alî û paşê jî yên din xwe di ser wî cihê ku mêrik got re avêtin û ketin binê holikê. Gava bayê hênik li rûyê wan ket tavilê dilşahiyekê ew girtin.

Mêrik ji wan re merşek li binê holikê raxist:

– Hûn bi xêr û silamet hatine, kerem bikin rûnin.

Yên din:

– Xêra Xwedê li te be, gotin, lê bîr nedibirin ku li ser merşê rûnin.

– Kerem bikin birano, nûnin.

Dengê mêrik bi kêf û eşq bû. Yên din jî li wir rawestiyabûn û ecêbmayî mabûn. Aşik Alî çû li erdê rûnişt. Mêrik xwe avêt milê wî û got:

– Li vî cihê şil rnûnenî birawo, li cihekî ziwa rûne, tu ê nexweş bikevî...

Mêrik bi kujekî merşê girtibû û ber hi wî ve dikişand.

– Hûn bi xêr û selamet hatine birano, hûn ser seran û ser çavan hatine.

Li yên din zîvirî:

– Kî zane bê hûn niha çiqasî li ber vê tavê şewitî ne, kî zane bê hûn niha ji ku tên, kî zane bê hûn niha çiqasî westiyayî ne, kî zane... Ka rûnin û bêhna xwe berdin. Kî zane bê hûn niha çiqasî birçî bûne. Hela ka rûnin, ka hebekî bêhna xwe berdin ez ê ji we re tiştekî...

Mêrikê ku ji kêf û şahiyan difûriya bi telaş dixuya. Yên din jî derbas bûn û li ser merşê, li kêleka Aşik Alî rûniştin.

– Navê we bi xêr?

– Yê min Aşik Alî, Aşik Alî got.

– Ma tu hozan î?

– Xwedê qismet kiribe.

– Dêmek tu hozan î...

– Ev heye ya, ev apê Aşik heye ya, ew bi stranên xwe lalan bi ziman dike, miriyan sax dike, çiya û zinaran dihelîne. Gava apê Aşik dest bi stranan dike, kulîlk, çûk û dar bi ziman dibin, heta ax jî bi ziman dibe. Ma li van zirecêbên çiyan, li Torosan, li Aladaxan, li Binboxayê, li Gawirdaxê yên ku navê apê Aşik nebihîstibin, heye. Gava navê Aşik Alî tê zimên zarokên di pêçekê de jî haş dibin, ava çeman disekine.

Bi carekê ve:

– Hişe Memedê zarok, Aşik Alî bi sert got.

Ew paşê zîvirî ser mêrikê bîstanvan:

– Memedê zarok ji xwe wilo dibêje, em li ku dengbêjî li ku...

Memedê zarok coş bûbû:

– Ez rast dibêjim, Memedê zarok bi dengekî bilind got. Hem jî apê Aşik Alî hozanê heqiyê ye.

– Hişe Memed, Aşik Alî mîna ku pê şa bibe, got. Hişe lawê min, bes e.

Paşê Aşik Alî ji mêrik li ber bîstên re got:

– De ka tu jî kerem bike û were li ba rûne.

Mêrik:

– Ser seran Aşiqê min, got û li ba wan rûnişt û çarmêrkî veda.

– Tu jî wî navê xwe yê xweş ji me re bibêje mêrê çê, peyayê qenc, zilamê çavfireh, birayê min yê bîstanvan, Aşik

Alî bi çavên hêsir got.

– Ji min re Ehmed, dibêjin, Ehmedê Şamam.

– Wey tu bi xêr û selamet bi vî navî bijî birayê me yê çê.

– Navê min jî Husuk e.

– Yê min Memed e.

– Navê min jî Memed e, lê ji ber vî apê Memed ji min re dibêjin Memedê zarok.

– Navê min jî Ûsiv e.

– Ew pir nexweş e, Memedê zarok got. Bi tenê ew îro bi tayê neketiye. Ew wilo bi tayê dikeve ku li nava tozê, li nav herî û çiravê vedigevize û çavên wî beloq dibin.

Memed peyva wî birî:

– Ger em kar bibînin û xwediyê kar heqê Memedê zarok bidiyê, ew ê ji xwe re cotek ga bikire, cotek gayê qulonçmezin, ha qulonçên wilo mezin, wek dasan.

– Erê, ez ê cotek gayên qulonçmezin bikirim, Memedê zarok got.

Ehmedê bîstanvan kete telaşê û tavilê rabû ser xwe:

– Wey li minê, niha hûn tî û birçî ne. Wey bêaqiliya min! Binerin, ha li vir bîreke min heye, ava wê weke bûzê ye.

Wî bazda, çû dewl avêt bîrê, kişand û ji wan re anî.

– Kerem bikin, vexwin, got.

Wî pêşî dewl dirêjî Aşik Alî kir.

– Ez herim ji mêvanên xwe yên hêja re xwarinekê hazir bikim.

– Em jî dikarin alîkariya te bikin, Husuk got. Tu xwe mewestîne, mirovê çê.

– Ez nawestim. Hûn bêhna xwe berdin. Ji xwe xwarin hazir e. Ez ê ji we re a niha bi bamya re savarekê jî çêbi-

kim.

– Tu meweste birayê hêja, Memed jî got.

– Tu xwe mewestîne, Memedê zarok jî got. Tu xwe mewestîne peyayê Çûkûrovayê yê herî qenc...

– Tu meweste, Aşik Alî jî got.

Mêrik darikê kibrîtê da bin qirşikên ku di kuçik de hazir bû. Bû qirçe qirça qirşikan û agir pê ket. Wî av, savar û xwê xist qûşxana li ber xwe û ew danî ser êgir û ji wir vekişiya û li wan nihêrî. Li wan dinêrî û bi kêf dikeniya. Carinan di nav re xayiz dibû, lê dîsan bi dilşahî dikeniya.

– Ka bila ev bikele. Wey li minê, a ez ê niha ji we re petêx û şebeşên cemidî bînim...

Hema wî ji cihê xwe baz da û çû çend petêx û şebeş ji leman kir, ew xistin hemêza xwe û vegeriya ba wan. Lê petêx û şebeş ji hemêza wî dişemitîn erdê. Memedê zarok û Memed bi bazdanê çûn alîkariya wî:

– Tu meweste bira, gotin, û rahiştin petêx û şebeşan û bi hev re meşiyan binê holikê.

– Ma kêr bi we re heye?

– Belê, heye, Husuk got.

– Ji xwe re bişkînin û bixwin, Ehmed got. Pir cemidî ne. Roj xwe nagihîne binê wan deviyan, şebeş pir cemidî ne, diranên mirov dêşîne.

– Spas bira, Husuk got û xencera xwe ji ber pişta xwe kişand. Xencer neqişandî, dudevî û ya çerkezan bû. Doxa wê jî ji qîlên fîlan bû û neqişandî bû. Gava bavê wî li Sarikamîşê şer kiribû, ew ji ber pişta rûsekî kuştî derxistibû. Her tiştê wî ev xencera wî bû. Gava Husuk şebeş dîlim dikir, Memedê zarok çavên xwe beloq kiribûn û li xencerê dinihêrî. Wê rewşa wî bala herkesî kişandibû. Gava Hu-

suk dîlimek şebeş jê kir û dirêjî Memedê zarok kir, hingî Memedê zarok veciniqî û ew dîlim ji destê Husuk girt. Gava ew şebeş xelas bû, Husuk yê din jî şikestand û ew jî xelas bû yekî din şikestand... Paşê dor hat petêxan. Ji roja ku ew hatibûn Çûkûrovayê devê wan bi dîlimek petêx û şebeş nebûbû. Lêbelê bîstan tije petêx û şebeş bûn. Bi rastî mîna ku Ehmedê bîstanvan gotibû, petêx û şebeş wek bûzê bûn.

Heta ku Ehmed bi kêf got, savar keliya, wan petêx û şebeş xwarin û heta qaşilên wan jî kotin. Li der û dora holikê, mêşên hunguv bi refan difiriyan, baskên wan ji tîrêjên rojê şîn û kesk dibiriqîn û derbas dibûn.

– Savar keliya, min vê sibehê jî bamye çêkiribû, dewê wek qeşayê jî heye.

Memedê zarok ber bi wî ve bazda, Aşik Alî jî... Wan qûşxane û sifra ku nanê sêlê tê de bû, anîn û li binê holikê raxistin. Gava wan qapaxa qûşxanê hilanîn, bêhneke xweş ya rûnê nîvişk jê fûriya.

– Kerem bikin birano, noşîcan be.

Ehmed kevçiyê pêşî di savarê da kir. Paşê jî Aşik Alî.

– Te pir xweş çêkiriye kekê Ehmed, destê te sax bin, Xwedê bide xêra miriyên te.

– Spas Aşik.

Yên çiyayî kişiyan ser savar, bamya û dew. Wan ji mêj ve xwarineke wilo bi lezet nexwaribûn. Bêî ku bipeyivin wan xwarina xwe xwarin û têr bûn.

Ehmedê bîstanvan:

– Ka hûn bîskê ji xwe re li vir razên. Ez ê êvarî jî ji we re...

Ji nişkê ve veciniqî, rawestiya, ber çavên wî reş bûn:

– Hûn êvarî jî li vir in, ne wilo?

Bi bergerîn li çavên Aşik Alî dinihêrî.

Aşik Alî fêhm kir:

– Em li vir in, em li vir in, bi lez bersiv dayê. Ma em ê herin ku, em li vir in. Em ê sibehê tê kevin rê û herin wir.

– Wir, ku ye?

– Em lê digerin.

– Li kê?

– Em li dara hinarê ya li ser girikê spî digerin. Te qet navê wê dara hinarê bihîstiye? Ew pîroz e...

– Min qet nebihîstiye, Ehmed bi stûxwarî got. Ma hûn ê çi bikin ji dara hinarê?

Rengê rûyê Aşik Alî hat guhertin:

– Ûsiv pir nexweş e, bi dengekî şewat got. Ew nexweşê mirinê ye. Ew tenê îro baş e. Tu ê bibînî bê ew ê sibe çawan bibe. Em ê ji bo wî ji wê darê şifayê bixwazin. Ew dara pîoz ji her derdî re derman e.

Memedê zarok ji nişkê ve got:

– Ew dara ha, ew dara ha wê kar jî bide me, bi bêhnçikiyayî got. Ew jin heye ya, ew jina ji vî gundê bi dar. Wê jina ji çiyayê Duldulê, ha wê jinê got. Wê got, ger hûn herin û hûn wê dara hinarê bibînin, ew ê gelek pere jî bide we. Ev sê mehên me ne ku em tî û birçî li Çûkûrovayê digerin. Kes pariyê nên nade me. Heta xwişka apê min Memed jî tu kar neda me, wê erza me şikand. Her kesî em... Do zilamekî ji vî gundî em... Ji Aşik Alî re jî...

Husuk bi hêrs çavên xwe beloq kirin, lêvên wî lerizîn:

– Hişe kuro kûçikbav, bi hêrs got. Kûçikê zimandirêj...

Memedê zarok ji ber dengê wî lerizî.

Ehmed rabû ser xwe. Ew bejinkurt bû û di çavên wî de

xemgîniyek hebû, xemgîniyeke welê ku te digot qey wî hîç dawî neyê.

– Hûn razên. Xuyaye hûn ê sibehê li vir bin? Baş e, belkî sibe jî... Belkî ez yekî ku cihê wê dara hinarê dizane bibînim.

– Bibîne, bira Ûsiv bi coş peyivî. Ji kerema xwe re bibîne da Xwedê me ji van derdan xelas bike.

– Hûn bêhna xwe berdin, razên. Ez ê ji we re êvrî...

– Xwedê ji te re razî be, bira.

Ehmed ket nava bîstên û pê re mijûl bû. Wî bi qasme cihok vedikir û av berdida ser bîstên. Ev karê wî heta bi esir dewam kir. Yên din jî xwe dirêj kiribûn, lêbelê xew nediket çavê yekî jî ji wan. Ew qet nedipeyivîn jî.

Gava dengê Ehmed hat, Aşik Alî rabû û li ser xwe rûnişt.

– Ma ez ji we re tirşikê çêbikim, Ehmed peyva xwe dubare kir.

– Birayê Ehmed, Aşik Alî got. Xwedê tu derdî nede te. Ma gelo em nikarin alîkariyekê bi te bikin. Em pênc peya ne.

– Ma hûn ê alîkariya min û çi bikin, tu kar nîne ku. A va ye min devê cihokan vekir û wê niha hemû bîstan were avdan.

– Bêhneke pir xweş tê, Aşik Alî got û pozê xwe bilind kir û bêhn kir.

– Gava bêhna erda avdayî tevlî bêhna bîstên dibe hîn xweştir dibe.

– Pir xweş bêhn dide, Ûsiv got.

– Çi bêhneke xweş, Memedê zarok got û pengizî ser xwe.

– Çi bêhneke xweş yaho, li vê Çûkûrovayê çi erdên bi bereket hene.

– Belê, hene, Memed got.

Siha bîhê ber bi rohilat ve çûbû, rojê dabû binê dara bîhê.

– Roj hatiye ser me.

– Bila were, Memed got.

– Ji berdêla ku em xwe wisan bi tiralî dirêj bikin, qet nebe me alîkariya vî zilamî bikira.

– Em bikin, Ûsiv got.

– Ew tiştekî ji me naxwaze, ew bi tenê dixwaze ku em çend rojan li ba wî bimînin, Aşik Alî got.

– Ma em dikarin bimînin? Husuk pirsî.

– Em nikarin bimînin, Aşik Alî got. Divê em wê dara hinarê bibînin.

– Ger em wê darê nebînin nabe, Memedê zarok got. Gava em wê darê bibînin, wê çend daxwazên min jê hebin...

Ew çû ba Ehmedê ku bacan diçinîn û dixistin selikê.

– Ger em wê darê bibînin, ez ê ji wê darê tiştekî bixwazim ku...

– Tu ê ji darê çi bixwazî, bêî ku Ehmed serê xwe rake jê pirsî.

– Ez ê çi bixwazim? Biner kekê Ehmed, biner, ez ê ji te re bibêjim bê ez ê çi bixwazim. Ez ê ji gulên sor yê wê darê bixwazim ku ew vî gundê bi spîndar bişewitîne û ez ê jê bixwazim ku ew wî peyayê bi otomibîl jî bikuje.

– Ma wî zilamî çi kiriye ji we?

– Ji me re xeber da. Aşik Alî hozanê heqiyê ye. Ji wî re jî, ji tembûra wî re jî, ji stranên wî re jî xeber da. Ger ew

dara hinarê wî nekuje... Ez ê wî...

– Ma tu dêhn î? Ehmed hi dengekî sert çû ser.

Memedê zarokê ku têgihîşt ku xwe daye dest:

– Min henek kir, kekê Ehmed, got. Ma ez ê ji ku wî gundî û wî zilamî bibînim... Ma tu ê bikaribî ji me re cihê wê darê bibêjî?

– Ka hela hûn çend rojekî li vir bimînin, bêhna xwe berdin, ez ê ji camêrinan cihê darê bipirsim.

– Cihê wê qet mepirse, Memedê zarok got. Ma qet dibe ku ew dar tunebe? Wê jinika ji çiyayê Duldulê ji me re got.

– Ger dareke weha hebe, ez ê jî ji we re cihê wê peyda bikim.

Bi benê holikê ve îsot, bamya û bacan hatibûn daliqandin. Memedê zarok li dora holikê diçû û dihat, her tişt, heta gêrik û kurmik jî di çav re derbas dikirin. Wî li her tiştî dinihêrî, şebeş, petêx, xiyar, kundir, firingî, her tişt di çav re derbas dikir û diçû vî serî û wî seriyê bîstên. Minminîkên mezin yên şîn, şîrikî, sor li nava bîstên digeriyan. Şebeşên mezin û belek bi leman ve li ser erda nerm xuya dikirin.

Memedê zarok li rex cihokê tam şeş hêlînên çûkan dît, di her hêlînê de jî sê hêkên pitikpitikî hebû. Gelo çûkên van hêlînan çûbûn ku? Van hêlînan jî ew newerqiland. Derdekî mezin di hundurê wî de hebû, wî bi xwe jî nizanîbû bê çi derd e. Derdê ku giriyê wî dianî, dilê wî teng dikir, nedihişt ew di qalikê xwe de hilê çi bû gelo? Wî ê çawan li rûyê hozanê heqiyê Aşik Alî, Memedê dirêj û xurt, Husukê bêhnteng û ji xwe bawer û Ûsivê li ber mirinê? Wî ji her tiştî şerm dikir. Ji ava ku vedixwar, ji nanê

ku dixwar, ji minminîkan, ji çûkan, ji kêzik û kurmikan, ji her tiştî şerm dikir. Wî nikarîbû li aliyê gundê bi spîndar binihêriya.

Ehmed agir dada, bacan, îsot, firingî, xirtik, hûr kirin, bamya neqand, pîvaz hûr kir û hemû xistin beroşa bi tenî û danî ser êgir. Yên din jî hi siya bîhê re çûbûn tê serê bîstên û li ser timikekî rûniştibûn. Gava Ehmed agir dada, ew jî rabûn ser xwe. Ji xwe germî êdî hebekî temirî bû, ewrên spî bêtir nepixîbûn, û hênkahiyê hêdî hêdî ew deşt hemû dixist bin tesîra xwe. Aşik Alî li pêş, Husuk li dû wî û li dû Husuk jî Memed û Ûsiv ketin nava werz. Wan hertiş di ber çav re derbas dikirin, petêx, şebeş, gul û kulîlk, li hertiştî dinihêrîn. Di ser wan re jî bêrawestan siya ewran derbas dibû. Li nava erdê birincê yê li hemberî wan bi sedan legleg li ser lingekî rawestiyabûn. Memedê zarok ji cihokê derbas bûbû, ketibû nav daristana li hember û dimeşiya.

– Ev lawê kûçikan diçe ku? Husuk bi hêrs got.

– Ew ê vegere, Memed got.

– Derdekî wî heye, Aşik Alî bi bişirîneke bi êş got. Însan benderuhekî ecêb e. Ger ji min re bigotana ev zarok yekî wilo ye min qet bawer nedikir. Dibêjin însana şîrê xav mêtiye, bi rastî jî weha ye. Ev însan benderuhên ecêb in...

Memed:

– Çi bi vî Memedê zarok hatiye?

– Tiştek pê nehatiye, Aşik Alî bi derd got. Tiştek pê nehatiye, lê bi min wilo tê ku wê tiştek pê bibe. Halê wî ne tu hal e hevalno.

– Çi pê hatiye?

– Qet kêfa min ji vê rewşa wî re nayê Husuk. Piştî wî

gundê bi dar...

– Min tiştek jê fêhm nekir, Husuk got.

– Tu ê paşê fêhm bikî, Aşik Alî got.

Peyva wan bi carekê ve hate birîn. Wan awirên xwe berdan ser refê hechecîkên ku hema wextî li serên wan biketana. Evqas hechecîk bi carekê ve qet nehatibû dîtin. Hechecîkên ku baskên xwe li hev dixistin û difiriyan, piranî jî li ser bîstên kom dibûn û dikir mîna roja qiyametê. Aşik Alî şaş û ecêbmayî dima ku çawan bi hezaran hechecîk di bin guhên hev re difirin û qet li hev nekevin. Gelo ew çawan wilo bi hezaran bi hev re difiriyan û li hev nediketin?

– Ev jî hikhmeteke Xwedê ye, wî xwe bi xwe got.

Wan berê xwe zîvirandibûn û li Memedê zarok ku ber bi wan ve dihat mêze dikirin.

– Divê em dara hinarê bibînin, an na ez ji vî lawikî ditirsim, rewşa wî xerab e.

Ew heta êvarî wisan li nava bîstên geriyan. Agirê binê beroşa Ehmed geh gur dibû û derdiket derveyî kuçik, geh jî ber bi binê beroşê ve dihat kişandin.

– Divê em sibehê zû têkevin rê, Aşik Alî rawestiya, li rûyên hevalên xwe nihêrî û got. Ev camêr qet naxwaze em herin... Ger em vê havînê tiştekî nekin û tenê li ba wî biminin wê rebeno ji kêfan dîn bibe.

– Camêr ji me hez kiriye, Memed got.

Aşik Alî keniya:

– Em ê çawan ji destê vî zilamê qenc bifilitin, em ê jê re çi bibêjin?

– Divê em herin, Husuk got. Karê me heye, divê em dara hinarê bibînin.

– Divê em herin dara hinarê bibînin, Memed got.

Husuk:

– Divê dara hinarê li van deran be.

Memed:

– Jinika çiyayî ev der tarîf kiribû, divê li van deran be.

Li jêr Anavarza, Keleba Dumuluyê, Keleha Maran, li jor Keleha Hemîte li wê beriya bê ser û bin mîna giravên ecêb dixuyan.

Piştî kurtedemekê Memedê zarok hat ba wan. Ûsiv hîç tevlî peyva wan nedibû, rûyê xwe yê bi rih ku bi qasî mistekê mabû dixurand û difikirî. Bi her awayî ji rewşa wî dixuya ku ew di hundurê xeyaleke kûr de bû, xayiz bûbû û kî zane bê ew di xeyalan de li ku bû. Yên din ber bi holikê ve meşiyan, Ûsiv bi wî awayî riha xwe dixurand û di nava wî erdî de ma. Siya wî dirêj bûbû. Dara hinarê mezin bû, mîna çinareke hezarsalî bû, mîna gwîza ziyaretê ya li Dikenliyê mezin bû. Şaxên wê ser girik hemû girtibûn. Çavkaniya ku ji binê wê difûriyan dida binê dareke hinarê. Binê darê, yanî serê girik hênik bû. Gava der û dor ji germê diperitîn, bayekî hênik ji binê dara hinarê dihat. Dorberî darê bi kulîlkên têvel xemilî bû. Tam di bin darê de jî kevirekî mermer î mezin dirêjkirî bû. Li hêleke kevirê mermer nivîsên ecêb, li hêleke din jî resimê serê jineke bi lêvên qalind, çavên mezin û porê dirêj hebû. Gulên dara hinarê ku bi rohilat re vebûbûn, di avê de mabûn. Av sor mîna alaviyê diherikî û hemû deşt, gîha zer, hîroyên pembe, pirêzên ku dibiriqîn, zinarên şîrkî, çemê Ceyhanê, bixuşkên hûr yên li rex çem, kokên qamîşan, erdên birincê yên ku ji birincê perçivî ne, ji ava ku diherikî sor î kur bûbûn. Ew sorahiya ku ji dara hinarê ber bi deştê ve diherikî, paşê diciviya ser hev û li jora çiyayên Torosê vedimirî û

winda dibû. Ev dara bi heybet û pîroz ji Mekeyî Mukerem hatibû anîn. Gava Hezretî Elî hatibû Çûkûrovayê û şûrê xwe li ba kiribû, û zirecêba Anavarza û çiyayên wê kiribû du felqe, û gava di ser stûyê xwe re nihêrî bû wî dara hinarê li ber xwe dîtibû. Dara hinarê a pîroz şax û pel û gul û rehên xwe dabûn hev û bi dû Hezretî Elî ketibû. Hezretî Elî di jiyana xwe de ne gulên wisa birqokî û sor, ne jî dareke weha kesk dîtibû. Hezretî Elî çû ba darê, piştî ku wî pelên darê yek bi yek mist da, got, hey dara pîroz, tu bide rê û here xwe di wî girikî de biçikîne, Xwedê li wir cih daye te. Li wir ber bide, pir bibe. Li wir ji nexweşan re bibe derman, ji bêhêviyan re bibe hêvî... Û dara hinarê çû xwe di wî girikî de çikand û rehên xwe berda binê erdê. Hema ku wê rehên xwe bera binê erdê da, ji binê erdê aveke sor pijiqî. Yên ku ji wê avê vexwarin hew bi tu nexweşiyan ketin. Kelmêş jî nikarin werin binê wê dara hinarê. Ne ew dikarin werin binê wê, ne jî nêzîkî wê bibin... Digel ku ser rûyê erdê û esman ji kelmêşan dikelin jî, lê kelmêşek jî nikare nêzîkî darê bibe, ne tenê nêzîkî darê, ew nikarin nêzîkî girik jî bibin. Mar û dûpişk û gêrik nikarin nêzîkî girik bibin. Xwînrêj, mêrkuj, zalim û diz nikarin nêzîkî girik bibin. Yê ku sê rojan di bin dara hinarê de razê, ew spîsaxlem dibe.

Li rexên avê pûnga bi pelên şîrkî, li ser zixuran... Ava ku ji zixuran dikele şewq dide, dibe xelek û diçe û tê. Bi şevan xezal bêî ku kes wan bibîne tên binê dara hinarê. Ew li dor dara hinarê dibin xelek û heta ku wenda bibin ew li dora darê zîz dibin.

Ûsiv ber bi keriyê xezalan ve meşiya û ket binê holikê. Bêhna rûnê heliyayî yê savarê û tirşika ku li ser êgir dikeli-

ya kete pozê wî. Ruyê Ûsiv di hundurê xeyalekê de mabû û rengekî nikenû stendibû.

– Çi bûye Ûsiv? Husuk pirsî. Şewq ji rûyê te difûre, çi bûye?

– Bêhna savarê ketiye difna wî, Aşik Alî got. Ma wekî din wê çi bibe.

Ûsiv:

– Em herin, em herin, em herin da em wê dara hinarê bibînin.

– Em ê herin Aşik Alî got. Lê ma ka ew li ku ye, cihê wê ji me re bibêje da em herin.

– Cihê wê kekê Ehmed dizane, Memed got. Ew ê ji me re bibêje.

– Ez cihê wê nizanim, Ehmed got. Lê wê sibe apê Hesen were vir. Apê Hesen yekî jîr e, li Çûkûrovayê çiqas dar, gul û gîha heye ew bi hemûyî dizane. Çiqas avên pîroz, çiqas şikeftên pîroz hebe, çiqas çûk û kêzikên bi şifa hebe ew cihê gişan dizane.

– Xuyaye ew Hekîmê Loqmanê vê demê ye, Aşik Alî got.

– Ev pêncî sal in ew gîhayên derman dide hev, tam pêncî sal in... Ew van çiyan, vê zirecêba Torosa li jor, vî çiyayê Nûr yê li jêr, ew kevir bi kevir, zinar bi zinar nas dike. Ew ji Hekîmê Loqman jî jîrtir e. Ew ji kesî re nabêje, lê ew jî mîna Hekîmê Loqman li dermanê mirinê digere. Ew ji panzdeh rojan carekê, ji mehekê carekê riya xwe bi min dixe. Di nava werz de kulîlkeke dirêj û sor şîn tê û ber bi esmanan pêl dide. Apê Hesen tê wê kulîlkê jê dike. Ew carinan jî wê kulîlkê nabîne, ha tu wê çaxê li rûyê apê Hesen binêre. Rûyê wî dibe mîna quzelqurtê.

– Dibe, Aşik Alî got. Mêşa hingiv bi qîmeta gulan dizane. Ma her mêş ji ku bi qîmeta kulîlk û gulan dizane!

– Ha binerin bê ew gula ha çawan dirêj bûye. Gava apê Hesen vê bibîne ew ê ji kêfan dêhn bibe. Gava ew vê kulîlkê bi vî awayî bibîne, ew ê bi kalîtiya xwe li dora wê govendê bigire û ji kêfan bifire. Ger ew sibe neyê ew ê dusibe were. Ew bi dema vebûna gulê, saet bi saet dizane.

– Hela hela! Aşik Alî got. Tenê alim bi tiştên weha dizanin.

– Ger dareke weha hebe, wê apê Hesen bi cihê wê bizanibe. Ger li vê deştê dareke weha hebe, li vê Torosa li jor, li vî çiyayê Nûrê yê li jêr, li vê Gawirdaxa li jor, li wê behra di bin wî ewrê spî de, li kîjan newalê, li kîjan bihurê, li kîjan kendalî, li rex kîjan çemî hebe ew ê apê Hesen bi cihê wê bizanibe.

– Ew ê bizanibe, Aşik Alî got. Karê me dikeve rê.

– Hûn dikarin li vir li benda wî rawestin.

– Ax xwezî li van deran karek jî hebûya...

– Teew, ku hebûya, Ehmed got. Nîne. Ma wê li nav vî bîstanî çi kar hebe? Hevdana petêx û şebeşan heye, ew jî danekî têra şeş kesan nake. Yê min jî perê ku ez heqê roja we bidim we nîne, ez bi xwe jî...

Dawiya wê negot.

– Kerem bikin werin bixwin, got.

Xwarin ji ya firavînê jî xweştir çêbûbû. Çiyayî dîsan kişiyan ser xwarinê.

Piştî xwarinê Ehmed çû petêx û şebeşên ku ji bo cemidandinê xistibû bîrê derxistin û anîn û şikandin. Şebeş wek xwînê sor bû, çirke çirk jê dikat, petêx zer, eyn mîna rojê bû.

Gava bû êvar Ehmed got:

– Hûn ê li vir nikaribin ji ber mêşan razên, got.

– Ma em çi bikin? Aşik Alî jê pirsî.

– Em ê êgir dadin, Husuk got. Em hertim wisa dikin, em êgir dadidin û li ber dixana wê radizên.

– Ne mimkun e ku em bikaribin bi êgir zora wan bibin.

– Stareya min mezin e, Ehmed bi kêf got. Li vir, di hundurê stareyê de... Hûn çend rojan li bendî apê Hesen dimînin bimînin. Binerin va ye gula wî ya sor mezin bûye. Ew bi çi awayî ji mezinbûna gulê fêhm dike ez nizanim, lê gava gul mezin dibe ew dide rê û tê vir. Ew mîna ewliyayekî ye, wê ji hemû derdên we re dermên bibîne.

– Baş e, Memedê zarok got.

Bû êvar û ro çû ava. Kelmêşan mîna ewrekî reş bi ser wan ve girt.

– Stare, Ehmed got.

– Ew dev li mirov dikin û derbas dibin, Aşik Alî got.

– Ev pêşî bi hestî ne, yaho! Memed bi ken got.

– Ev pilingên Torosê ne, kelmêşên Çûkûrovayê ne, Aşik Alî got.

– Hê xerabtir in, Husuk bi ser ve zêde kir.

Ehmed stare ji ser holikê daxist û anî û ketin binê holikê. Bi rastî jî ciblikeke (stareyeke) mezin bû, hemû ketin binê wê. Kelmêşan bi vize viz dora ciblikê pêçan.

– A niha ger li derve hespek, çêlekek, kerek, gurek, pilingek hebe wê ev kelmêşên han wan bixwin, wê çermên wan di xwînê de bihêlin.

Hema ku wan serên xwe danîn ser behlîfên ji gîhayê digel wê germê jî ew tavilê di xew re çûn.

Li vir, jiyana wan di nava vî bîstanî de wilo dewam dike û ew li benda Hesenê gîhavan in. Herçî Ehmedê li her bîstên e, ew ji ber mêvanên xwe dilşa ye. Ji ber ku wê mêvanên wî bi hatina Hesenê gîhavan re biçûna, wî newêrîbû li aliyê Anavarzayê li riya Hesen binihêriya.

Ûsiv di hundurê van hersê rojan de, her sibeha Xwedê hi tayê diket. Ûsiv hem dişewitî û hem jî diranên wî ji serman bi şingînî li hev diketin. Mazûbanê wan Ehmed di hundurê van hersê rojan de mazûbaniyeke bêqusûr ji wan re kir û bêhawe li ber Ûsiv ket. Ger du canê wî hebûna, bêî ku ew bifikire wî ê canekî xwe bida Ûsiv. Ax, ger karek li van deran hebûya, karek li nav vî werzî hebûya ku ev çiyayiyên baş ji xwe re heta payizê bixebitiyana û çend quruş pere têxistina bêrîkên xwe û destvala bi ser maliyên xwe de venegeriyana... Di hundurê van hersê rojan de wan hertiştê xwe ji Ehmed gotin. Ehmed hînî hemû tiştên wan bû. Gayê zer ku hate qurbankirin, bizina ku hate firotin, xwişka ku li rûyê wan nenihêrî, hunerên dûrî aqilan yê dara hinarê... Paşê her êvar, Aşik Alî tembûra xwe dixist hemêza xwe, xwe bi ser de xwar dikir û bi dengê xwe yê bi şewat digot. Dil û hinav li mirov perçe dikir. Stranên nedîtî li ser Çûkûrovayê, li ser zalimtiya însanan, li ser kelmêşên xwînmij, li ser germa ku hestiyê mirovan jî dişewitand, digot. Û çavên wî jî hertim li riya Hesenê gîhavan bû.

Bi derketina rojê re, bi gewrbûna serê Gawirdaxê re û bi ronahîbûna çiyayên Duldulê ve hew dîtin ku Hesenê gîhavan telîzek li piştê ye û bi dengê "Ehmed, Ehmed, kurê min Ehmed" û di ber wan de derket. Rû û rûçikên Eh-

med bû mîna xweliyê.

– Va ye hat, bi dengekî mirî got. Ew hat, Hesenê gîhavan...

Hemû kêfxweş bûn û li mêrik zîvirîn. Hesenê gîhavan zilamekî zirav û dirêj bû. Hebekî ber bi pêş ve tewiyabû û bi gavên mezin ber bi wan ve dimeşiya. Ew tavilê gihîşt ba wan. Riha wî ya firk ku rûyê wî yê zirav nixumandibû daketibû heta ser zikê wî. Riha wî spî, bêî leke û dibiriqî. Stû û rûyê wî di nava qermîçokan de mabû, bûbû mîna tevna pîrê. Çavên wî yên kesk ku kort çûbûn mîna du dilopên ronahiyê dixuyan. Ew hema dikeniya, bi pîrqînî dikeniya. Yê ku ew bidîta, wê bigota vî zilamî li vê dinyayê qet derd û kul, xem û keder nedîtiye.

– Gulên min mezin bûne, mîna bizotan sor bûne, ez tam di wextê de hatime. Ez dema wan dizanim. Ez dizanim bê li vê dinyayê, li nav kîjan erdî, çi gul, kengî şîn tê. Kalikê min jî, kalikê kalikê min jî, kalikê wî jî dizanîbû. Xwedê sulala min ji bo berdewamiya Hekîmê Lokqman afirandiye. Hemû gul, gîha, dar ji bo tiştekî çêbûne... Her kes û li vê dinyayê karekî wan heye, yê me jî karê me ev e.

Ew ji sulala Hekîmê Loqman dihat, Hesenê gîhavan bi vê pesnê xwe dida, wî ne dizî kiriye, ne kes xapandiye, ne kes pelçiqandiye, wî ne zilm kiriye, ne erza kesî şikandiye, koka wî ji zemanan û bi vir de li vê Torosa bê ser û bin gîhayê didin hev û wek derman li nexweşan belav dike. Hesenê gîhavan li ku însanekî bibîne jê re qala xwe dike, hundurê xwe jê re vedike, ew qîmetê dide însanan. Ew pir qîmetê dide karê xwe jî.

Gava wî ev pênc peya li hemberî xwe dît, ew dilşa bû, wî

dest pê kir û ji wan re behsa serpêhatiya gîhayê ya pêncîsalane kir. Wî bêî ku bêhna xwe berde behs dikir.

Ew ji zimanê çûkan, yê gêrik û kêzikan fêhm dike, ew ji zimanê gîhayê, yê daran û yê hemû gulan fêhm dike. Ew ji zimanê ava ku diherike, bayê ku tê, ewrê ku difire fêhm dike.

Wî ew gula sorîkur hil kir û hat. Ji kêfa dikira bifiriya.

– Ev gul heye ya, ev gul... digot. Ev gula sor heye ya, ew di tarîtiya şevê de mîna perçak roj dibiriqe. Mirov tîrêjên wê têê ji dûr ve dibîne. Xwedê zane bê wê ev gula ha çend mirovan ji êş û nexweşiyan xelas bike. Ev gula ha...

Aşik Alî xwe bi hêdîka nêzîkî mêrikê dilşa dikir. Gava tam xwe gihand ba wî, got:

– Hesen axa, ev çend roj in em li vir li benda te ne, şikir ji Xwedê re va ye tu hatî.

Çavên Hesen yên di kortikên xwe de vebûn:

– Belê ez hatim, ma gelo hewcedariya we bi gîhayekê, bi gulekê, bi dermanekî hebû?

– Belê, heye, Aşik Alî ji dil got.

– Bêje wê çaxê, Hesenê gîhavan bi ken got.

Piştî ku Aşik Alî çend caran xweziya xwe daqurtand, got:

– Li van deran dareke hinarê hebûye, li ser girikekî bûye.

Aşik Alî di vir de sekinî, Hesenê gîhavan çavên xwe yên mîna polayê ber bi wî vekirine, birûyên xwe qermiçandine û li benda dawiya gotina wî ye.

Aşik Alî zû bû zû, mîna ku wê gotinên wî ji devê wî baz bidin gotina xwe berdewam kir:

– Xwedê giravî ew dara ha bi kêrî yên ku bi tayê ketine

tê. Em ê Ûsiv bibin ber wê darê. Ev Ûsiv heye ya... (Bi destan Ûsiv nîşan da) Ji ber tayê ruh tê de nemaye. Ger em wê dara hinarê nebînin wê Ûsiv bimire.

– Wê bimire, Memed jî got. Heyf e, Ûsiv zilamekî pir baş e, bila nemire. Ax, ger me ev dara hinarê bidîta...

Hesenê gîhavan:

– Hûn çi dibêjin ji bo Xwedê wilo? pirsî.

– Bi tenê tu ê cihê wê darê bizanibî. Ji te pê ve li vê Çûkûrovayê, li van Torosan kes wê cihê dara hinarê nizanibe.

Wan hêla mêrik ya qels qefaltibûn û bi wê riyê didan ser wî.

– Dibêjin ku tu bi reha her gîhayê, zimanê her gîhayê, xûyê her gêrikê dizanî.

– Hûn çi dibêjin ji bo Xwedê?

– Tu zanî Hesen axa, rewşa me xerab e. Ger em wê darê nebînin, em ê av û av herin. Xwedê zane, tu cihê vê darê dizanî, Hesen axa. Ji kerema xwe re cihê wê darê ji me re bibêje...

– Ji bilî wê dara hinarê a pîroz tu hêviyên me nemane.

– Ûsiv nexweş e...

– Em perîşan in...

– Ev du-sê meh in em li vê Çûkûrovayê digerin, em ji însanetiyê derketine.

– Em ji însanetiyê derketine, lê me tu kar jî nedîtiye.

– Ger em wê dara pîroz bibînin û em şevekê li bin wê razên, em ê ji hemû derdan pak bibin.

– Kê ev ji we re got?

– Herkesî. Li Çûkûrovayê herkesî ji me re behsa vê darê kir.

– Wan gotin ku ger hûn wê darê nebînin hûn îflah na-

bin...

– Kê got?

– Wê jinika ji çiyayê Duldulê. Ha ji vî gundê bi dar.

– Wê got, bi tenê ew dara hinarê dikare alîkariya we bike.

– Yê ku li vê Çûkûrovayê li bin wê darê ranezên îflah nabin.

Hesenê gîhavan wilo ji xwe re bêdeng, bi bêhnfirehî û bi rûkenî li wan guhdarî dikir, paşê bi dengekî bi xwe bawer:

– Li Çûkûrovayê dareke wilo pîroz tuneye, got. Û bi ser ve zêde kir, ax, xwezî ku hebûya...

– Heye, Aşik Alî bi dengekî bi bawerî got. Heye!

Memed:

– Heye!

Ûsiv:

– Heye!

Husuk:

– Ma qet dibe ku tunebe? Tu cihê wê nizanî û tu ji dara me re dibêjî tuneye!

– Tuneye, Hesenê gîhavan bi înad got. Ger hebûya min ê cihê wê bizanîba.

– Tu cihê wê nizanî, Aşik Alî got.

– Tu cihê wê nizanî, Husuk jî bi dengekî gur got.

– Ez cihê wê dizanim, Hesenê gîhavan got. Li telê wî ketibû.

– Ger tu cihê wê dizanî wê çaxê ji me re bibêje, Aşik Alî got.

– Tuneye, ku ez bizanibim.

– Heye.

Ehmedê bîstanvan xwe avêt ortê, ew bîskê nerm kirin,

ew li bin siya bîhê da rûniştandin û şebeşê cemidî ku ji bîrê derxistibûn, şikand û li ser gîhayê belav kir.

Roj bilind dibû.

– Kerem bikin.

Wan dest bi xwarina şebeş kirin.

Piştî ku hebekî bêhna Hesenê gîhavan hat ber wî:

– Hebû, got, li vê Çûkûrovayê gelek darên pîroz hebûn. Ji vir û heta behrê tije darên hinaran bûn. Di mehên havîn û biharan de van daran gulên wilo sor vedidan ku ew mîna pêlên behrê li ba dibûn. Di bin gulên hinaran de marên reş baz didan ser hev, ew sor î kur dibûn... Li vê deştê tu dar neman. Wan hemû dar ji kokê de birîn. Niha li Çûkûrovayê ne darên hinaran, ne yên berûyan mane, ne çam mane, ne dirîreşk mane. Li vê deştê tiştekî pîroz nemaye ku dara hinarê bimîne. Ji xwe hinareke wilo pîroz tunebû. Çi tiştên baş û mervan hebûn hemûyan dan rê û ji Çûkûrovayê bar kirin. Ger dareke wilo pîroz li vê beriya Çûkûrovayê hebûya wê niha zû de şax û pelên xwe bidana hev û bida rê û ji Çûkûrovayê bar bikira. Dareke wilo tuneye. Ger hebe jî ew şifayê nade, ji derdê wê re tu dermanî nabîne.

– Dareke wilo heye, dîsan Aşik Alî got.

– Wê ji derdê me re bibe derman, Memed got.

– Tu çareya wê nîne, Ûsiv got.

– Ger ew tunebe, dareke wilo nehatibe dinyayê, wê çaxê warê me kor bû, Husuk got.

– Rabin ser xwe, Aşik Alî got û pengizî ser xwe. Divê em wê dara hinarê bibînin.

– Çawa dareke wilo tuneye...

– Li ser girikê spî...

– Li ser girik...

– Sorahiya wê li hemû deştê belav dibe...

– Bi qonaxa rojekê mîna agirekî sor dike...

– Wê çima ew jinika ji çiyayê Duldulê derewa li me bike?

– Wê ji ber dereweke wilo çi têkeve kîsê wê?

– Em ê wê darê bibînin.

– Em ê wê darê bibînin û bigihîjin miradê xwe.

Ew pir hêrs bûbûn. Digel vê jî wan ji Ehmedê bîstanvan re gotin:

– Di xweşî û silamtiyê de bimîne, mirovê qenc.

– Qenciya ku te bi me kir bavê me jî bi me nedikir.

– Ji xwe dinya ji ber qenciya mirovên weha li ser lingan maye.

– De bi xatirê te... gotin.

Ew bi lez ketin rê û di nava gîha û diriyan de meşiyan. Ew ber bi pozê Anavarzayê yê rohilat ve meşiyan. Heta ku ew ji ber çavan wenda bûn, Ehmed xwe dabû zer pozikên solên xwe û li wan dinihêrî, paşê ew zîvirî ba Hesenê gîhavan û rûnişt:

– Ew çûn, got. Aax karek tuneye, xwezî li ha min karek hebûya û min bida wan.

Hesenê gîhavan:

– Cih pir li wan teng bûye, ew dara...

Ehmedê bîstanvan bi telaş peyva wî birî:

– Ew ê bibînin, ew ê wê dara hinarê bibînin. Ma ew ê çawa wilo destvala vegerin malê?

Hesenê gîhavan bi telaşa Ehmed hebekî nerm bû:

– Kî zane, got. Belkî jî ew bibînin. Însan e, pir kerametên însên hene.

– Pir kerametên însên hene, Ehmed jî got.

Ew bi rohilat re gihîştin ber çemê Savrunê. Ava çemê Savrunê wilo kêm bûbû ku ew bûbû mîna ciboka kaniyekê. Wan xwe di ser çem re hol kirin aliyê din. Ji jor ve gundekî bi xaniyên kelpîçî xuya kir.

– Em herin gund, Husuk got.

– Nabe, Aşik Alî got. Heta ku em dara hinarê nebînin em narin tu gundî.

– Ger em neçin gundan em ê ji ku cihê dara hinarê bibînin? Husuk bi bergerîn got.

– Em ê bibînin, Memed got.

Ew ketin rê. Ew heta bi bazinên lingên xwe di toza rê de diman. Hê tava rojê baş germ nebûbû, ew toza ku diket çaroxên wan lingên wan yên hênik mist dida.

Hew dîtin ku ji hember traktoreke tûrincî hêdî hêdî ber bi wan ve tê.

Gava traktor nêzîk wan bû, wan xwe ji ser rê dan alî û rawestiyan. Rengê tara li serê şofêrê traktorê jî tûrincî bû. Gava traktor tam hate ber wan, şofêr sekinand:

– Selamuelêkum paleno, got. Xuyaye we karê xwe xelas kiriye û hûn vedigerin?

– Belê, em vedigerin, Husuk got.

Yê şofêr bi çavên xwe yên reş û mezin ku dibiriqîn, bi xemgînî got:

– Heyf e, îsal li Çûkûrovayê tu kar tunebû. Ji niha û pê ve jî wê bi zehmetî peyda bibe.

– Rast e, Husuk got.

Gava yê şofêr xwe hazir kir ku traktorê bajo:

– Ka rweste, Aşik Alî got.

Şofêr li wî nihêrî:

– Ma tu hozan î? jê pirsî. Kerem bike hozan, ma gotineke te heye?

– Belê heye, Aşik Alî got. Em li dara hinarê ya li ser girikê spî digerin, ma tu cihê wê dizanî?

Rûyê şofêrê ciwan yê esmer hat guhertin, çavên xwe hûrik kirin û demekê fikirî.

– Min ne girikekî welê dîtiye, ne jî ez bi cihê dareke welê dizanim. Li qusûra min menêrin.

Lêwik traktora xwe ajot û çû.

Husuk ji nişkê ve wek dînan hêrs bû:

– Ma mirov cihê dareke wilo ji zarokekî wilo dipirse? bi hêrs got.

– Dareke wilo... û zarokekî wilo! Memed jî got.

Ûsiv jî hêrs bû:

– Ma wê ev zarok ji ku bi cihê darê bizanibe? Mirov ji zarokên wilo dipirse?

Memedê zarok nedipeyivî, ew xayiz bûbû û di xeyalan de kûr çûbû. Tiştek ji rûyê wî nedihat fêhmkirin. Rûyê wî bemû maneyên xwe winda kiribû.

Aşik Alî jî hat ser ya wan:

– Min nizanîbû, got. We dît bê rûyê lêwik çiqasî baş û mulahîm bû. Ger wî cihê darê bizanîba wî ê tavilê ji me re bigota.

– Ew nizane, Husuk bi dengekî gur got.

Di rê de siwariyek derbas bû. Li dû wî jî erebeyeke hespan... Sê kalemêr di hundurê erebê de hebûn.Li dû wan jî otomobîlek di ber wan re derbas bû û ew ji serî heta binî di tozê de hiştin. Paşê zilamekî li dor çilî, î bi şewqê qeselî, bi kincên lacîwert û bi solên spî, di ber xwe de tiştin digo-

tin û bi lez di ber wan re buhurî. Çavê yekî ji wan jî di mêrik de nebuhurî ku cihê dara hinarê jê bipirsin.

Ro bû nîvro, tava rojê germ bû û ew jî ji germa şewitîn. Ew bêî ku bipeyivin di nav erdan re derbas bûn, hatin ser çemê Savrunê û li ber siya kendêl rûniştin. Buxçika xwarinê ya ku Ehmedê bîstanvan ji wan re dagirtibû, vekirin û dest bi xwarinê kirin. Ava çemê Savrunê bûbû wek ava hemamê û zer bûbû û hêdîka diherikî. Ji mecbûrî ji wê avê vexwarin. Piştî xwarinê wan xwe dirêj kirin û heta ku bayê xerbî hat, ew razan.

Pêşî Aşik Alî rabû û li ser xwe rûnişt û bi dû wî re jî yên din rabûn. Wan li rûyên hev nihêrîn û bêdeng man, nizanîbûn ku wê çi bikin. Rûyê Aşik Alî bi carekê ve bişirî, wî ji hember ve zilamekî ku tene didêra dît.

– Binerin wa ye yek li wî hemberî tene didêre.

Yên din jî ew peya dîtin û kêfxweş bûn. Bêî ku ew bipeyive AşikAlî li pêş yên din jî li dû wî bûn û berê xwe dan mêrikê ku tene didêra.

– Qawet be.

– Xwedê ji we razî be! Kerem bikin, kerem bikin. Xwedê hûn ji min re şandine. Ma hûn dizanin tene bidêrin?

– Belê, em dizanin, Aşik Alî got. Ma melêvên we têra me dikin?

– Şeş melêvên me hene, wê heval bihatana, lê do li gund xirecir derket û du kes hatin kuştin.

– Derbasbûyî be...

Mêrik:

– Navê min Resûl e, got.

Yên din jî xwe bi mêrik dane naskirin.

– Kerem bikin, bila herkes rahêje melêva ku ew jê hez

dike.

Memedê zarok li wê derê wilo bêdeng ma.

– Ev hê zarok e, ew nizane tene li ha bike, Husuk got.

Li Memed zîvirî:

– Memedê zarok, got, tu here li bin siya wê erebeyê rûne.

Bêî ku lawik tiştekî bibêje, çû ber siya erebê rûnişt û pişta xwe spart tekerê wê. Hebekî wê de, li qiraxa cihokê kelbeş bi navekê bilind bûbûn û li ber bayê xerbî hêdîka li ba dibûn.

Yên din jî dest bi bakirina bênderê kirin. Hê berî ku bibe êvar wan hemû bênder xelas kirin. Perê ku heq kiribûn Resûl cihê cihê xist mista wan:

– Gelekî spas birano, we ez xelas kirim, got. Min bi serê xwe nikarîbû ev bêndera ha di sê rojan de bidêra û wê li vê derê kelmêşan ez bixwarima. Heta ku hûn şîvê nexwin ez we bernadim.

– Em bi lez in, Aşik Alî bi qurnazî got. Divê em wir bibînin, divê em bigihîjin wir.

– Ku?

– Dara hinarê ya li girik. Ma tu bi cihê wê darê dizanî? Li vê Çûkûrovayê herkes bi cihê wê darê dizane... wan cihê wê ji me re gotin...

– Cihekî li van deran ji me re tarîf kirin...

Hela ka hûn rûnin nanê xwe bixwin, ew hêsan e. Rast e, wê li van deran li cihekî dareke hinarê hebe. Hela hûn rûnin. Jinikê bi têra deh kesan xwarin şandiye. Hela ka hûn rûnin bi bêhna fireh xwarina xwe bixwin, wê niha Mele Hecî gula wî di ber guhê wî de û were. Ew her roj, li ku dibe bila bibe ew gulekê dibîne û dixe ber guhê xwe. Ew ê

pişrî kêliyekê di vir re bibuhure, ew ê ji nav baxçeyê pirtûqalan derkeve were. Baxçeyê pirtûqalan jî bi tenê huvdeh dar tê de hene. Her zivistan baxçê wî di bin avê de dimîne û ew jî her bihar ji nû ve huvdeh darên nû diçîne. Xwedê zane ew bi cihê wê dara hinarê dizane.

Şewqeke qurnazane di çavên wî de pêket.

– Hela hûn xwarina xwe bixwin, belkî ez jî cihê wê darê derxim, li van deran dareke wilo heye.

Resûl sifre raxist, beroş danî orta sifrê. Du mirîşkên heşandî di beroşê de bûn. Di firaxeke mezin de jî birinceke têrrûn hebû. Pale kişiyan ser xwarinê. Wan bi lezeke wilo xwarin ku tavilê xwarin xelas kirin.

– Ji kerema xwe re ji me re cihê wê darê bibêje, bira, digotin. Ew dara ha ji me re pir lazim e. Ger em cihê wê darê nebînin nabe...

– Ev du meh in ku em li Çûkûrovayê ne. Ne me karek bi dest xist ne jî tiştek... Wê Ûsiv jî bimire. Em ê hemû ji nexweşiyê bimirin.

– Ka bisekinin, ka bisekinin, mêrik got û fikirî. Ka bisekinin ez carekê bifikirim û bînim bîra xwe, wê cihê wê darê niha were bîra min.

Wî serê xwe dizîvirand û li jêrî rê dinihêrî:

– Ev Mele Hecî jî nehat.

– Zû bifikire, birawo, Aşik Alî bi bergerîn jê re got. Zû bifikire ku berî tarî dakeve em xwe bigihînin ba wê dara pîroz.

– A niha, a niha...

Resûl li Zinarên Anavarzayê, li çemê Savrûnê, li çiyayê Duldulê dinihêrî, ew ji cihekî li bendî hawarekê bû.

Tam di wê navê de serê Hecî xuya kir. Resûl bi kêf ber

bi wî ve baz da:

– Em li bende te bûn Seyda, got. Çavên me li riya te qerimîn. Binêre em ji mêj ve li benda te ne.

Ew bêî navbir dipeyivî:

– Jineke ji van gundên jêr ji van camêran re qala dara hinarê kiriye. Wê ji van camêran re gotiye ku bûn şevekê li bin wê dara pîroz razên wê Xwedê we ji hemû derd û belan pak bike. Ev hevalên me jî, binêre wan di bêhnekê de bênder ba kirin, ew li wê dara hinarê digerin. Jinikê ev der ji wan re tarîf kiriye, baş e ku wê kiriye. Ma min û te me ê ji ku bikarîba ev zirbêndera ha ba bikira? Min jî ji wan re gotiye ku li van deran girikek haye, lê dar lê heye an jî tuneye, ez nizanim, min got zanibe zanibe wê Mele zanibe.

Hecî:

– Ez cihê wê zanim, got. Pir qenciya wê darê gihîştiye min û gundiyan. Lê ew paşê hişk bû.

Paşê wî bi desta girikek nîşan da:

– Binerin, dara hinarê li ser wî girikê han î gewr bû. Ew mîna çinarekê mezin bû. Gava mehên bihar û havînan gul dida, ji dûr ve mîna komek bizot dixuya. Yên ku li bin wê, li ba wê, li ser erda wê şevekê razana, çi bixwestina Xwedê dida wan. Binerin ha li wir e, ne zêde dûr e. Ger we bivê hûn dikarin îro li ba me bimînin...

– Hûn dikarin heta sibe nîvroyê alîkariya me bikin, Resûl got. Ez ê hê gelek pere bidim we. Hûn dikarin sibe nîvro ji vir bidin rê û hûn ê li dor êvî bigihîjin ba dara hinarê. Binerin, wextî ro here ava. Heta ku hûn bigihîjin wir wê tarî dakeve erdê, wê çaxê ne dara hinarê, hûn nikarin girik jî bibînin.

Xebera Resûl bû. Ew wê şevê li wir man. Lê kelmêşan

nehiştin çavên wan herin ser hev. Kelmêşên wê şevê ne guh didan êgir, ne jî guh didan dixanê... Sibehê zû dest bi kar kirin û heta bi nîvro xebitîn:

– Em ê herin ba dara hinarê, gotin, perên xwe ji Resûl standin.

Mele Hecî bi desta cihê dara hinarê nîşan dida û ji wan re behs dikir. Ew jî ji kêfan di qalikê xwe de hilnedihatin.

Ew berî bi esir gihîştin ber girik û hilkişiyan serê girik. Wan li ser girik tdu darên şîn nedîtin. Lê tam li orta girik wan qurmê dareke qalind ku rehê wê li ser girik hemûyî belav bûbû, dîtin.

– Me dît, Aşik Alî bi kêf bang kir. Pir şikir ji Xwedê re va ye me dît. A ev e. Ev reh, rehên wê dara hinarê ne.

– Rehên wê ne, Husuk jî got.

– Ger dar bi xwe nemabe jî, koka wê maye, Memed got. Ha koka wê, ha gewdê wê, ha gulên wê yên sor, ha şaxên wê, ha pelên wê...

– Hemû yek e, Ûsiv got.

– Em dia bikin, Aşik Alî got û destên xwe ber bi Xwedê ve vekir. Wan berê xwe bi qible vekirin û hêdî bi pistînî dia xwendin. Bi tenê Memedê zarok tevlî dia wan nebû.

– Ma tu nizanî dia bikî, Memedê zarok? Aşik Alî jê pirsî.

– Ez dizanim, Memedê zarok got.

– Êê?

– Dar bi xwe miriye. Xêra wê negihîştiye wê ku bigihîje me...

– Hişşş, Husuk got û ber bi wî çû. Hişşş tu ê belakê bînî serê me. Hişşş zarokê pîs, ma mirov tu carî li hemberî dareke pîroz wilo dipeyive?

Yên din jî mîna Husuk gotin. Belkî heta nîvê şevê wan ji lêwik re behsa darê û behsa kerametên darê kirin. Lê lêwik guh nedida wan, peyvên wan dixist guhekî û di yê din re derdixist.

Bayê xerbî ku ji êvar de dest pê kiribû, êdî bûbû mîna bahozekê. Ji ber bayê xurt kelmêşan nikarîbûn xwe li ser girik ragirtina. Ew wê şevê heta sibehê bi rehetî raketin.

Pêşî Aşik Alî şiyar bû. Tembûra wî li ber serê wî bû. Destê xwe da tembûrê. Hertim gava ew şiyar dibe divê ew pêşî destê xwe bide tembûra xwe. Ev yek riya xêrê li ber wî vedike. Piştî Aşik Alî Memed, piştî Memed Ûsiv û piştî Ûsiv jî Husuk şiyar bû. Ew daketin jêrî girik, pişta xwe bi girik vekirin, ketin rêzê û mîz kirin. Gava wan mîza xwe kirin ferq kirin ku Memedê zarok ne di nava wan de ye. Li çavên hev nihêrîn.

– Belkî ew li van deran be, Memed got. Em lê bigerin em ê wî bibînin. Dibe ku jî ew niha vegere û were.

– Ew venagere, Aşik Alî bêhnek berda û got. Çi lawikekî qenc bû. Derd û kula wî cotek gayên bi qulonç bû.

– Xencera min? Xencera min... Husuk got û hem xwe dipeland hem jî bi girik ve radipelikî.

– Xencera min, xencera min nexuyaye! Lêwik êvarî xencera min biriye û çûye.

Jê pê ve tu deng ji Husuk jî derneket. Ew demekê wilo bêdeng li ser girik rûniştin. Paşê mîna ku Aşik Alî ji xewê şiyar bûbe:

– Xuya bû ku wî ê tiştekî welê bikira, got. Xwedê bike xerabiyek neyê serê wî. Tiştê bû bû.

Yên din nepeyivîn.

Ew ji ser girik daketin jêr, Aşik Alî da pêşiya wan û wan

berê xwe dan çiyayên mor ku di nava dixanê de mabûn û ya Xwedê û ber bi Bînbogalar ve meşiyan. Ji milê çepê, pir ji dûr ve serê çiyayê Duldulê hêdî hêdî gewr dibû.

Li dor nîvro wan Dikenlî derbas kiribûn û ketibûn riya Karatepeyê. Bêhna zozanan, bêhna çaman û bêhna pûngê dikete bêvilên wan. Memed ketibû pêşiya wan û bi gavên xurt dimeşiyan. Ew demekê sekinî, bi helkehelk got:

– Wan gayê min ê zer kirine qurban, hey Aşik Alî. Gava ez çûbûm ew li dûv min giriyabû, eynî weke însanan...

Aşik Alî nizanîbû wê çi bigota. Ew dîsan meşiyan.



Çukurova çavkaniya çîrok û romanên Yaşar Kemal e. Hem Çukurovayê Yaşar Kemal kiriye nivîskarekî cîhanî, hem jî Yaşar Kemal Çukurova cîhanî kiriye. *Dara Hinarê* jî ji çavkaniya Çukurovayê dizê. Yaşar Kemal di vê romana biçûk de serpêhatî û qedera çend çiyayiyan bi êş û elem, bi xemgînî û dilşahî, bi reşbînî û hêviyên wan ve, bi zimanekî herikbar û destanî radixe ber çavan.